

JI BO ŞUREYA ZIMANÊ KURDÎ

Em wek Komîteya Ziman û Perwerdehiya Navendî ya KCK'ê di serî de, li çiyayên azad, ew çiyayên ku dergûşî û malbêçîtî ji hemû şoreş û pêşketinên mirovahiyê Yên yekemîn wekî ziman, hizir, çand, şaristanî, mîtolojî, dîn, felsefe, zanist û hwd. Kirîne; ev çiyayên ku ji dîrokê heta îro çand, ziman û hebûna gelê Kurd parastîne, ji gelê Kurd re bûne perstgeh, çeper, kozik û stargeh şureya we ji dil û can silav û pîroz dikîn, silav û rêzên xwe ji hemû beşdervanên şurayê re dişînin. Ji niha de em hêvîdarin û bi hêvîne ku ew şura wê bibe biryar bingeh û xîmekî xurt ê yeketiya ziman, çand û wêjeya Kurdî, wê bibe xîmê bingehê yekîtiya neteweyî û hemû kurdên lî cihanê li devdora xwe kom bike.

Wek KZPKurdî ya Navendî ya KCK'ê me jî jidil û can dixwest ku em jî tevlî wê şureya pîroz bibîn, lê mixabîn derfet û pêkanên me ji bo vê yekê dest nadin. Lewre jî em xemgînîya xwe tînin ziman û em dixwazîn bi vê belgeyê wê valatîyê dagirîn.

“Di kîjan cih û demê de bibe bila bibe, yê ku hemû agahî, berhevok û ezmunên gerdûnîbûyîn (evrenselleşen) vedişêre û vediguhêze dema ku têjîyankirin ziman e. Bi vî awayî mirov bi ezmunên hinekên din dikeve nava çalakiyan.” -Orhan hançerlioglu

“ziman ji bo lihevkirina di navbera mirovan de navgînek xwezayî ye; saziyeke civakî ye û malê gel ê hevpar e û navgîna yekgirtin û parastina neteweyan e; avahiyeke tekûz e ku ji dangan hatiye ristîn e; pergala peyman û hevpeymanên nepenî ye ku xîmê wê ji demeke ku nayê zanîn ve hatiye avêtin”

“mirov di zimanê xwe de veşartî ye”

“ziman şertê heyîne yê pêşîn e”

“ziman hizir bixwe ye”

“zimanê neteweyekê riha wê neteweyê ye, riha wê jî zimanê wê ye”

“Tu neteweyeke bêziman nikare were hizirandin, lewma divê xebatên di barbarê zimanê Kurdî de çalaktir bin. Ma çima heta niha Saziyeke Zimanê Kurdî nîn e. Ataturkî jî dema nû komar damezirand, destpêkê Saziya Zimanê Tirkî saz kir. Divê em jî bi lez bigihên saziyeke bi vî awayî. Ger heta niha saziyeke bi vî awayî nehatiye avakirin, ev yek kêmasiyek e û divê di demek berî demekê de ev kêmasî ji holê were rakirin.

Her wiha ev yek weke Akademiya Ziman jî dibe. Ya girîng ew e ku di demeke zûtirîn de, di warê zimanê Kurdî de saziyeke wiha pêk bê. Divê ev xal werin nîqaşkirin û bigihîjin biryara sazîbûna Zimanê Kurdî.”

“Ji bo zimanê bijartî jî divê hêdî hêdî komîteyek li ser kar bike û bixebite. Niha dema vê ya rast e û derfetên vê yekê jî hatine afirandin. Divê ji bo Kurdiya bilind komîteyek were damezrandin. Kî ji ziman fêm dike, dikare dîroka ziman a heta roja îro lêkolîn bike, wan zanînan berhev bike û bi rêya xebateke demdirêj a vê komîteyê ve dikare zimanekî resen û hevpar ê kurdî saz bike. Yanî mirov dikare Soranî, Dimilkî, Kurmancî û Goranî jî pêş bixe. Piştî jî gel dikare vê yekê weke zimanê xwe bi kar bîne. Divê sîstema ziman wisa were meşandin. Heta ev yek pêk were jî divê her zarava di qada xwe de xebatê bimeşîne, bi wî zimanî klaman biste, biaxuve û çawa dixwaze dikare wisa bi kar bîne. Azadiyeke bêşînor... Em li vê derê nikarin zagonên vê yekê ava bikin. Ev tiştêkî xwezayî ye. Ji bo tiştên xwezayî hem dem û hem jî cih hewce ye.”

Ziman, navgînek wisa ye ku divê di destpêkê de hemû rêzan(kural) û azîneyên (yontem) bikaranîna wî bîn zanîn. Di heman demê de rastbikaranîna ziman “armaneke” ku berpirsariyên neteweyî, çandî û civakî ferz dike.

Gelî beşdarvanên bi rûmet û hêja, wekî hûn jî dizanin li ser ziman, pêşketina ziman, dîroka pêşketina ziman, têkilîyên dinabera çand, ziman û hizrê de, bi taybetî jî li ser ziman û dîroka zimanê kurdî gelek tişt hatîne gotin û teorî hatîne pêşxistin, têne gotin û pêşxistin, wê ji niha û şûnde jî bêne gotin û pêşxistin. Em ê nekevîn nava wan tişt û dîroka zimanê kurdî ya ji hezar salî vir ve. Em di vê baveriyê de ne ku gelek beşdarvan wê dîroka ji hezar salî vir ve binîrxînin. Ji ber vê yekê û ji bo ku zêde dirêj nebe, em li ser wê narawestîn. Li vir em dixwazîn bi kurtî be jî li ser nêrînên giştî ên di derbarê pêşketina ziman û zimanê kurdî de, hoy û mercên ku rê li ber pêşketina çand û ziman vekirîn û bi taybetî jî em ê pêşketina çand û ziman di nava hev de binîrxînin. Levre pêşketina çand û ziman bi hev re ne, ji hev nayên qutkirin, dema ku em wan ji hev qut bikîn û cuda bigirîn dest, wê demê her du jî wê nivîşkan bimînin û baş nayên fêmkirin. Lewre “ziman awêneya çandê ye.” Ê

ku zimanê wî hebe çanda wî heye, an jî berevajiyê vê yekê yê ku çanda wî hebe zimanê wî jî heye. Tî çand bê ziman û ti ziman jî bê çand nayê fikirîn û ne gengaze jî.

Rojekê hinek diçin cem hizirmendê mezin **Konfûçyûs** û jê dipirsin û dibên:

-Hheke rojekê ji bo rêveberiya welatekî banî te bihata kirin, gelo karê ku destpêkê tedikir ewê çi biba?

Hizirmendê mezin bersiv da û got:

-“Bêguman min ê bi di berçav derbaskirina ziman re dest pê bikira. Lewre heke ziman bi kêmasî be, gotin hizrê baş venabêjin. Heke hizir baş nehat vegotin karên ku divê bîn kirin rast nahên kirin, heke kar û peywir li gorî ku tî xwestin neyên kirin an jî pêk nehên, wê demê çand û kevneşopî wê xerabibin. Dema çand û kevneşopî xerabûn wê demê dad wê bikeve riya şaş. Dema dad ji rê derket gelê ku keti nava şaşiyê wê nizane ka wê çi bike û nizane ka encam wî karî jî wê bigihêje ku derê. Ji ber vê yekê jî tu tuşt wekî ziman ne girîng e.”

“Hebûna çandî bi ziman gengaz e. Di vê mijarê de ziman, faktoreke herî girîng e. Ger zimanê dayîkê tê qedexekirin, ev nijadkujiya (jenosîd) çandî ye... Ji nijadkujiya fîzîkî xeternaktir e

Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hîn zimanê xwe yê dayîkê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne

Yê ku qeyd û kelepçe li zimanê wî hatibe xistin, li mejiyê wî, dilê wî nerîna wî jî qeyîd û kelepçe hatiye xistin.”

Levre jî em ê çand û ziman bi hev re bigirîn dest û binîrxînin.

ÇAVKANIYÊN BINGEHÎN ÊN ŞARISTANIYÊ

Em ê di vî beşê de sedemên rê li ber şaristaniya me ya îro vekirine ji aliyê cografî û dîrokî ve hewl bidin ku şîrove bikin. Em êdî baş dizanin ku ji bo mirov civakê baş nas bike divê mirov şertên cografî û dîrokî yê wê civakê baş nas bike.

Ji dema mirov ji prîmatiyê veqetiya û ghişt heta şoreşa cotkariyê, dîrok niha bi tevahî heta heft milyon salan dûr diçe. Cih Rojhilatê Efrîka xeta Rîf e. Çi bermahiyên arkelojîk, çi jî hebûneke zêde cinsên nêzî insên li herêmê aniha vê tezê piştrast dikin. Bi temamî nayê zanîn, gelo qutbûn bi rêya mûtasyonê (bi pêşketineke ji nişka ve), yan jî bi beridîna re çêbûye, jixwe ev yek ji bo mijara me jî girîng nîne. Ji bo

cinsê em behsa wî dikin, sîstema qirikê rê dide karibin gelek dengan derxînin, meznahiya mejî avantaj e. Rîf a Rojhilatê Efrîka hem çol û daristan, hem jî xwedî gol in ku ev jî ji bo ewlehiya cinsê em behsa wî-wê dikin stratejîk e. Nemaze wextê timî ber bi golê ve reviyane, çûne, heye ku pûrt û pirça xwe wenda kirine û li şûnê bûne xwediyê mûyên îro bi mirov ve hene. Rewşa bahewayê jî ji bo vê yekê li cih e. Avantajeke din a Rîfê ew e ku wexta gelî û perav bêne şopandin rêyeke xwezayî ye ku xwe digihîne Torosan. Ev rê herdu parzemînan (Asya û Efrîka) digihîne hev û ji hev dike. Tê texmînkirin ku yên li Rîfê weke klan bi milyonan sal mane. Mirov dikare bibêje; timî bi nava Efrîka ve koç kirine. Gelek agahî hene; nîşan didin ku belavbûna vî cinsî ya dinyayê esas li ser xeta bakurê Rîfê pêk hatiye. Tê texmînkirin ku heta bi homo sapiens (mirovê difikire) gelek cins û texlîd bi heman rêyê belav bûne. Li deverên din ên dinyayê heta niha şopên cinsê bişibe mirov nehatine dîtin. Cinsên heta niha hatine keşîfkirin bi koka xwe ji Rojhilatê Efrîkayê ne.

Li deverên cihê yên dinyayê gelek fosîlên temenê wan herî kêr mîlyon sal in, hatine dîtin. Tê qebûlkirin ku bi tevahî cins, beriya serdema çaremîn a qeşayî li dinyayê belav bûne.

Li gorî feraziye û îhtîmalan di tevahiya vê dema dirêj de cinsên mirov weke klanên ji bîst-sîh kesî tevgeriyane, debara xwe bi nêçîr û berhevkirina pel û pincaran kirine. Di çêbûna dest û lingan de van herdu çalakiyan roleke grîng bi cih anîne û ev fikir bi giştî tê qebûlkirin. Bermahiyên fosîlan jî nîşan didin ku di şikeftan de, li giravan û di stargehên li ser daran de li cihên ewle mane. Hîne malbat û milkiyet çênebûye. Mirov dikare bibêje ku di vê demê de klan bi xwe malbat e. Tê texmînkirin ku karîbûne bi zimanê îşaretan (zimanê deng û beden) li hev bikin, û deng gihandine asta sembolan. Em niha baştir fêhm dikin ku ji bo ziman xwe bigihîne asta sembolan pêvajoyeke dirêj a pratîk hewce dike.

Li gorî lêkolînan, li derdora sedûpêncî-dused hezar salan berê cinsê sapiens nêzî zimanê sembolan bûye. Heman lêkolîn nîşan didin ku li şûna zimanê îşaretan cara pêşî dayika zimanên modern, zimanê deng û xwe gihandiye dengên sembol jî li gorî texmînan berê pêncî hezar salan li ser heman xeta Rîfê di bakur re li dinyayê belav bûye. Lihevkirina bi zimanê sembolan avantajeke mezin e. Mirov dikare bifikire ku komên baş li hev dikin û tevdigerin serdest bûne. Dibe ku sedema bi lez qirbûna cinsên din girêdayî vê rewşê be. Dem di heman

demê de serdema Qeşayê ya Çaremîn e (pleîstosen). Yek ji texmînan dîsa ew e ku di wê demê de cinsê Neanderthal zêdetir e, lê herdu bûyer li hev rast tîn û dibe ku dawî li cinsê Neanderthaler tîne. Efendiyê nû yê dinyayê bi tevahiya heybeta xwe li ser dikê ye: Homo Sapiens, Sapiens = mirovê difikire û dipeyive. Em di destpêkê de cihêbûna nijad û ziman nabînin. Lê em dikarin texmîn bikin ku weke komên mezin tevgeriyane, bi plan nêçîr kirine, şikeft weke mal û perestgeh bi kar anîne, jinan pel û pincar berhevkirine û mêr jî di nêçîrê de pîspor bûne. Li gorî hin berhemên arkeolojîk îspat dikin ku cinsê dipeyive li ser hîmê me behskirî têra xwe pêş dikeve. Xet û resmên li herêma navbera Franse û Spanyayê, û resmên li şikeftên Colemergê hatine dîtîn ji vê demê mane. Herdu herêm jî ji bo koçberiyên ji Efrîkayê li cihekî baş in. Ev qad li cihekî wisa ne, xwe gihandina wan di ser Rojhilat û Rojavayê Derya Spî re mumkîn e. Ev yek bi teoriya giştî ya koçberiyê û belavbûna li dinyayê re li hev dike.

1- MIROVATÎ ÇI DEYNDARÊ KEVANA TOROS-ZAGROS E?

Di derketina Rîfa ji Rojhilatê Efrîkayê de gelek arguman hene ku me difikirînin, deriyê sereke yê li ber kombûne û ji vê navendê li dinyayê belavbûne kevana Toros-Zagrosan e. Ya yekemîn, ev kevane dawîya rêya xwezayî ya ji Rîfê ye. Ref bi ref tîn vê derê. Çi Sehreya Mezin û çî jî çola Erebiştanê mîna ji rojhilat û rojava ve deriyên xwe girtine, ji lewra peravên Suveyş û Rojhilatê Derya Spî bi awayekî xwezayî dibin rêyên pê belav bibin. Peravên Başûrê Derya Spî jî di ser Tengava Cebelîtariqê re ber bi Spanya û Ewropayê ve rêyeke duyemîn teşkîl dike. Li gorî rewş û şertên cografî bi qasî Rojhilatê Derya Spî bi xêrûber nîne. Astengiyên ciddî û pîrsgirêkên mezin ên qût û xwarinê hene. Rêya herî îdeal ji peravên Rojhilatê Derya Spî pêve di Hîlala Bi Bereket re derbas dibin ku ji kevane rêzeçiyayên Toros-Zagrosan re Hîlala Bi Bereket an jî Hîlala Zêrîn tê gotin. Şertên vê derê ewqas li cih in, mumkîn nîne cinsê mirov nebe civak û pêş nekeve.

Ji vir em dikarin xusûsa duyemîn derxînin: ji bo mirovan rewşa xweş ya av û bahewayê, erdên bi xêrûber, nebat, fêkî û darên mêwan, hebûna gelek nêçîran, şikeftên ewle û stargehên qenc, hebûna gelek rûbar û çeman, paşê di bîra mirovan de têngîna 'cennetê' çêkirin. Herêmên çol ên nêzî van deveran wexta li ber hev hatin girtin, tê fêhmkirin, çima di bîra mirov de rê li ber dualîteya cennet-cehennemê

vekiriye û weke yek ji tégînên bingehîn cih girtiye. Piştî Rîfa Rojhilatê Efrîkayê mirov vê qadê dikare weke qada duyemîn a herî zêde lê cinsê insên kom bûye, bihesibîne. Eger em vê deverê di dîroka mirovatiyê de ji aliyê pêşketina şaristaniyê weke devera 'kurkketinê' bi nav bikin wê zêde nebe gotinek ne di hedê xwe de ye. Her weha weke devera çîrok û çîvanokên destanwarî yên mirovatiyê lê hatin nivîsandin an jî ya rastî lê dest pê kirin çêbûn jî mirov dikare pîroz bike. Şoreşên mezin ên piştî çêbibin jî wê berhemên vê destana pîroz bin.

Ya sêyemîn, li derdora sedûpêncî hezar sal berê kombûna li vê qadê li ser hîmê zimanê îşaretan pêş ketiye. Ji zimanekî paşvemayî yê mîna îşaretan gavavêtina ber bi zimanê sembolan, potansiyeleke mezin a pêşketinê ye. Li herêmeke berfireh pêkhatina komên mirovan ên xwedî ziman rê li ber civakbûnê, starê û qûtpeydakirinê vedike. Belkî jî di dîrokê de şoreşa herî mezin a nav lê nehatiye kirin û hîne keşfa wê nehatiye kirin, ev e. Belkî li cih be ku em ji vê şoreşa mezin re bibêjin; 'ŞOREŞA ZIMAN'. Ji ber ku ti şoreşê bi qasî vê şoreşê li ser vê cografyayê rê li ber civakbûnê venekiriye. Her roj tégîneke pîroz (heywanên nêçîrê û nebatên nû yên tên keşifkirin) tê çêkirin, pergaleke nêzî ya malbatê tê avakirin (cara pêşî avakirina stargehan) û her çar demsal bi hemdê xwe li ser vê cografyayê xwe nîşan didin. Wexta ev pêvajoyê hemû bi tégîn dibin; zimanê hevpar ên civakên berfireh çêdibe û pêre cara pêşî 'NASNAME' ya civakan ji hev cihê dike, pêk tê.

Mixabin, çî rewşeke xembar e, li van deveran ku cara pêşî etnîsîte çêbûn, îro qirkirineke hov a nasnameyan heye. Ya em jêre dibêjin; 'pêşketina mezin a civakî' di vê pêvajoyê de bi tégîn û bûyerên dewlemend pêk tê, ya rastî tê avakirin. Bi pêşketina tégînan re, rê li ber pêşketina fikrê jî vedibe. Îhtîmaleke mezin e, mirovên bi tégînan li hev dikin û pê digihîjin hev, êdî nabe weke klanan bimînin û ji bo civakbûneke hîne jor dikevin nava dînamîzmeke mezin. Ez wer bawer dikim ku ev qad yek ji qadên bingehîn e, divê hem ji aliyê antropolojî û hem jî ji aliyê serdemên berî dîrokê ve, were lêkolîn.

Li gorî zanista jeolojiyê berî bîst hezar salan serdema qeşayî ya çaremîn bi dawî dibe. Zanistên din jî bi agahiyên xwe vê yekê wexta destek dikin, ev tespît nêzî rastiyê ye. Îspat bûye ku berî deh hezar salan baran û hêşînî li Erebistan û Çola Mezin hîne zêdetir bûn. Ev rewşa têr derfet û îmkanan dide, bi dema destpêkirina şivaniyê re li hev rast tê. Tevî vê yekê, pêşketineke din a mezin; ji zimanên destpêkêyê Efrîkayê pêşketîtir koma zimanên semîtîk xwe nîşan dide.

Çanda semîtîk di cewherê xwe de ‘çanda şivantiyê ye’. Mînak şivantî ewçend bi qîmet bûye, çandêke mezin a ketiye serhev der barê mih, bizin, deve û heywanên din de hebûna xwe hînê dewam dike. Li ser vî hîmî em dibînin etnîsîte pêk tê û nasnameyên cihê çêdibin. Hebûna çandêke xurt a etnîsîteyê (eşîr) di wê astê de ye ku vê çavdêriya me îspat bike. Di gelek gotinên şaristaniya Sumer û Misrê de bandora vê çandê tê dîtin. Li derdora şeş hezar sal berê, bi rewşa av û bahewayê ya baş ve girêdayî, çanda Semîtîk ji Sehra Mezin heta Rojhilatê Erebiştanê, ji Bakur jî heta zeviyên ji bo cotkirinê bi xêrûber, wisa şop hiştine, mohra xwe li dîrokê xistine. Qada çanda semîtîk weke dewam û qonaxêke çanda Rîfa Rojhilatê Efrîkayê pêşketiye. Ev nişê di vê qonaxê de paşê wê bi dînen yekxwedayî xweseriya xwe pêk bîne.

Lê belê bi taybetî divê ez bibêjim, ev çand li şûna ku di pêkhatina şaristaniya Misr û Sumer de diyarker be, li ser qada herdu şaristaniyan bi navê Aramît û Apîrû (mirovên gemarî û tozgirtî yên ji Rojava û Rojhilat hatine) di dîrokê de wê weke yekemîn qebîleyên dagirker bêne qebûl kirin. Semîtîk di şeveqavêtina dîrokê de pêkhatineke gelekî girîng in, mîna ku bi dengên lingê xwe erd hejandibin û hatibin. Li Bakur ji erdên bi xêrûber nebihurîne, sedema vê jî dibe ku pêşketina çandêke ji ya wan xurttir be. Em dikarin ji vê çandê re bibêjin; gav bi gav ketina nav çanda zevî û cotkariyê, her wisa belkî jî li cih be ku em vê çandê weke ‘çanda zeviyan’ jî bi nav bikin. Jixwe di dîrokê de ji vê pêşketina dîrokî re ‘Aryen’ dibêjin. Bi maneya kesên xwedî zevî û xwedî erd (Arî li ser van erdan xwediyê çanda yekemîn in, û di kurdî de bi maneya ‘ax, cih û zevî’ tê bi kar anîn) mirov dikare bi nav bike. Aryeniyên ku bakurê Semîtîkan, kevana Toros-Zagrosan weke qadeke sereke cara pêşî li cotkariyê vekirin, mirov dikare wan weke afîrînerên cotkariyê bi nav bike.

Di vê pêşketinê de, av, ba, hewa, erdên bi bereket, texlîdên heywanan û nebatên cûrbecûr rol lîstine. Li deverên Semîtîkan cotkarî li wahayên1 teng bi hebûna xurme û çend cureyên din pêk dihat, lê li aliyê din ê kevanê zevî ji bo çandiniyê gelekî baş bûn. Li vir zeytûn, bindeq, çilo, hevrîst, rez, qût û zad baş digihiştin. Dîsa gelek heywanên tîn kedîkirin di serî de mîna mihên kovî, bizin, dewar, beraz, kûçik û pisîk li deverê kom bi kom digerin. Li banî û zozanên çiyê daristanên mezin hene. Çar demsal bi temamî têne dîtin. Baran

mîna ku bi rêkûpêk av bide dibare. Kevî û devên gelek çem û rûbaran ji bo avakirinê xweş bûn. Di nav van şert û mercan hemûyan de êdî 'dema şeveqavêtina dîrokê' bûyerek e ku divê biqewime.

Li gorî tespîten jeolojî û serdema destpêkê, li deverê beriya panzdeh hezar salan qeşayê xwe vekîşandiyê çiyar. Tê texmînkirin ku tevahiya sedhezaran salî cinsê mirov li vê deverê kom bûye. Piştî şoreşa ziman a li deverê û xweferzkirina çanda Semîtîk li herêma demeke kin serdema mezolîtîk²pêk tê û paşê derbasî serdema neolîtîk dibe. Şikeftên li Colemergê gelek îşaretên serdema mezolîtîk û serdema piştî wê dide me. Di vê mijarê de kevirên hatine verotin têra xwe delîlan pêşkêşî me dikin. Em dibînin li herêma gavên mezin bi serdema neolîtîkê re hatine avêtin. Gelek delîl hene ku beriya duwanzdeh hezar salan çanda neolîtîk li vir dest pê kiriye. Ev serdema ku em dikarin weke Şoreşa Gund, Zevî û Cotkariyê jî bi nav bikin, çî ji alî mirovatiyê û çî jî ji aliyê şaristaniyê ve (dîroka nivîskî) weke şertekî pêş xuya dike. Bi serê xwe Serdemê Çandê ya mezin e. Girîngiya vê çandê bi qasî were zanîn nehatiye dîtin û di dîrokê de cihê heq kiriye nedîtiye. Ji lewra mirov çiqas li ser vê çandê rawest e, li cih e. Wexta Gordon Childe dibêje; girîngiya vê çandê ji çarsed salên dawî yê çanda Ewrûpaya Rojava kêmtir nîne, hînê zêdetir nêzî rastiye ye. Di vê serdemê de ewçend îcad û vedîtin hene ku bi jimartinê naqedin. Cotkarî, pîşesazî, çûnûhatin, star, huner, rêveberî, dîn û bi tevahî pêşketinên li deverê di asta şoreşê de ne. Di her warî de bi hezaran rastiye nû hatine keşîf kirin û nav li wan hatine kirin.

Bi vî awayî ji zimanê Semîtîk berfirehtir û heta di ser xizna teng a zimanê şivantiya Semîtîk re 'Koma Zimanê Aryen' bi gewde bû. Mîna ku hafîze û bîra mirovatiyê ya wenda nebe, hîmê wê hat danîn. Ev koma zimên bi çand ji Hindistanê heta peravên Ewrûpayê belav bû ku ev yek jî careke din analîza me ya di vî warî de piştrast dike. Weke tê bawer kirin, koka koma zimanê Aryen ji Ewrûpa, Hindistan û herêma (Bakurê Derya Reş, kepirên Rûsya, zozanên Îranê) di navbera herduyan re derbas dibe, nîne. Koka wê li devera kakil a Kevana Bi Bereket e (Hîlala Bi Bereket). Hem analîza gotinê (Aryen) ya etîmolojîk, hem jî têkiliya rengê gotinên bingehîn ên etnîk ên di nava tevahiya komên ziman ên Hind-Ewrûpa de tene bikaranîn vê rastiye piştrast dikin. Ya hînê girîngtir ew e ku devera em behsa wê dikin ji bo

çandê herêma kakil û dendikê ye, ji lewra bi awayekî pirr xwezayî pêkhatina ziman û gotinan jî divê li vir çêbibe. Avahiyên çandî yên etnîk ên hînê hene û delîlên dîrokî yên din vê rastiyê bi zêdeyî îspat dikin.

Wê wextê fêhmkirina hebûna nişşê duyemîn ê çand û ziman, dîrok û belavbûna wê, çi ji aliyê pêşketina civakî û çi jî ji aliyê qonaxa şaristaniyê (bi bajar) ya gihiştîyê, xwedî cihekî dîrokî ye. Em dikarin bibêjin ku tebeqeyên din ên berê bi tevahî di nava van herdu komên çand û ziman ên sereke de heliyane. Tenê wexta heman serdema qeşayî bi dawî bû, piştî wê li keviyên başûrê Sibîryayê (Yaqûtîstan û hwd.) koma çand û zimanekî sêyemîn çêbû. Ev çanda ku neh hezar sal berî niha ber bi başûr ve belav bû, heye ku welatê wê yê esasî Çîn be. Mirov dikare bibêje; ji vê çanda ku seriyê wê yê başûr digihîje heta Fîniyan di serî de Tirk, Moxol, Tatar, Koreyî, Viyetnamî û Japonî weke nişşê sêyemîn ê Bakur çêbûn. Li parzemîna Emerîkayê çanda bi koka xwe ya Çermesoran jî di ser Tengava Beringê re di encama belavbûna heman demê de pêk hatiye û di vî warî de em xwedî delîlên xurt ên arkeolojîk, etîmolojîk û etnolojîk in. Em Eskîmoyan jî dikarin bixin nava vê komê. Gelek çandên Efrîkayê yên hînê hene, tevî ku xisletên xwe yên hezaran salî diparêzin jî tesîrên xurt ên koma Semîtîk li ser wan hene. Nemaze yên di nav koma zimanê Sahilî de cih digirin welê ne. Di nava kûrahiya daristan, çiya û çolan de jî mumkîn e mirov li klanên weke berî mîlyonan salan dijîn rast bê.

Li gorî vê tabloyê, di serî de li bakurê navîn ê başûrê dinya me, berî niha bi şeş hezar salan, sê komên ziman û çandê yên bingeîn ji bo destpêka şaristaniyê çêbûne. Pirr normal e ku çandên behsa wan tene kirin gelek caran bidin û bistînin. Bi bandora dîrok û cografyayê xwediyê xisletên cihêwaz in ku ev yek îro jî bi hêsayî tê dîtîn.

Ji aliyê mijara me ve yek ji xusûsên girîng ew e ku dema em çavkaniyên şaristaniya Hind-Ewrûpayê lédikolin, divê em çavkaniya dayik e, rast teşxîs bikin. Zanista dîrokê, çanda kakil a di bin bandora zeman-mekan de pêşî li ber çav digire û li ser radiwest e. Em îro baş dizanin ku çanda kapîtalîst jî belavbûneke xwe ya dijwar a kakilî heye. Têgihiştinên li dîrokê yên xewn û xeyalî yên çavkaniyên xwe tinene, derbên xedar li serwextbûna me didin. Kesên nikaribin têgihiştina xwe ya dîrokê bigihînin şîroveyeke gelekî girîng wê nikaribin şîroveya xwe ya îro manedar bikin. Mumkîn nîne mirov civakeke bê dîrok bi temamî fêhm bike û lê serwext bibe.

Çawa ku îro şaristaniya serdest yanî modernîteya kapîtalîst xwe dispêre koka şaristaniya Hind-Ewrûpayê, çanda Hind-Ewrûpayê jî xwe dispêre çanda çavkanî ya Aryen û şaxên wê yên Sumer û Misrê. Eger em di şaristaniya mirovatîyê de pîrsgirêka çemê sereke yanî dayik û şaxên wê rast analîz nekin, em roja me ya îro jî nikarin rast bi nav bikin. Şaxên (rûbarok) ji çemê sereke yanî dayik diçin, xurt diherikin, lê hin ji wan di nîvê rê de zuha dibin û dimiçiqin. Her weha çavkaniya çemê sereke jî xwedî maneyeke diyarker e. Eger em dixwazin pêşketina civakî ji aliyê dîrokî û cografî ve bi temamî fêhm bikin, divê em gerekên rêbazê di çareserkirina pîrsgirêkan de biceribînin.

2- PIRSGIRÊKÊN BELAVBÛNA ÇAND Û ZIMANÊ ARYEN

Nêzîkatîyên ku şaristanî û çandan di dîrokê de weke bingeş dibînin kêma in. Yên heyî jî xwedî nêrînên cihê ne. Em hewl didin ku pîrsgirêkên li vir çareser bikin, li ser hîmê çand û şaristaniyê çareser nakin. Em neçar in, zeman û mekanê şaristanî û çandê di pêşketina civakê de bi qasî diyarkerî û kêrhatina wê bigirin dest û li ser rawestin. Naxwe droka li ber destê me (ku pirranî weha ye) wê ji 'komeke bûyeran' wêdetir nebe xwediyê ti wateyeyekê. Ev taybetmendiye bi çavaniya ne ku mirov hînî zanista dîrokê dike, mirov ji hînbûna wê digire ve girêdayî ye. Hema bêje dîrok ji gidîş û lodeke dîn, xanedan, qral, şer, qewm û hejmareke rastiyên weke wan pêk tê; pêşketina civakî hîn nake, ji bo pêşiyê li hînbûna wê bigire piştperde dike. Ev hewldanên îdeolojîk in, zêhn û hafîzayê ji desthilatdar û îstîsmarkaran re amade dikin. Şewazên vegotinê yên bi vî awayî amûrên propagandayê yên ji gelekî berê de mayî ne ku li ser hîmê îdeolojîk di rewakirina desthilatdar û îstîsmarkaran de têra xwe diyarker in.

Girêdayî daxuyaniya me ya der barê sîstema agahî-zanîn û rêbazê de em hinekî din bi analîza xwe dakevin.

a- Em dibêjin; koma ziman-çanda Aryen çî di warê ziman de, çî jî di avakirina binesaziyêke bi kok a çandî de hîmekî girîng daniye û ev yek jî bi şertên dîrokî û erdnîgarî (cografî) ve girêdayî ye. Salên navbera 10.000-4000î B.Z'ê, 'dema dirêj' a bi cihbûn û bi sazîbûna vê çandê û vî zimanî îfade dike. Li nêzîkê demê her cure kûzikvanî,

ji bo ajotina zeviyân bi karanîna gêsin û hevсарê lawiran, tekelik, tevn û destar hatine peyda kirin, huner û dîn bi sazî bûne. Lîsteyeke dûvdirêj a berhemên lawir (heywên) û riwekan (nebatan) di zêdebûna şênîyan de xwe îspat dike. Ji kevirên baş hatine verotin û seqakirin tenê bivir, kêr, aş, tekerik, mîmarî, hunerên din û berhemên dînî nayên çêkirin; di dema kalkolîtîkê de ji kevirên madenê berhemên hînê baş û qenc têne çêkirinê. Em îro jî li gelek mînakên van berhemên rast tîn. Ji navenda erdkolanê ya Bradostiyân a li keviyên Zagrosan heta navendên erdkolanê yên li nêzî Qota Berçem (Çayonu) û herî dawî jî li Êrfayê (Gobeklîtepe) ku heta yanzdeh hezar sal berê diçe û ev yek hatiye peyîtandin jî; li wan deran li rastî mînakên mîmarî olî û xaniyên mezin ên ku bi kevirên baş hatine verotin, şehkirin û niqirandin hatin çêkirin û her weha gelek amûrên ji kevirên madenan hatine çêkirin hatine.

Xelkê herêmê îro jî van amûrên çandê û koma gotinên van amûran îfade dikin, bi kar tînin, ev jî nasnameya devera kakil an jî dendik rohnî dike. Di zimanê Ewrûpî de îro jî bi dehan peyvên têne bikaranîn meseleya çavkaniyê zelal dike. Mirov hin ji van gotinan dikare weha rêz bike: Geo-cih, erd, jin, roj, bra, mur-mirin, sol, neo-nû, ga, gran-gram, meş, xweda-guda-gudea û her wekî din. Ji koma gelên otantîk (gelên xwecîh ên herî kevin) yên herî têne naskirin Kurd, Fars, Afgan, Belûcî hînê jî van gotinên kok ên me jimartin bi kar tînin û ev yek jî nîşan dide ku koma çand-ziman a Arî ji çavkaniya Ewrûpa û Hindê nîne, ya me gotî berevajiyê vê yekê îspat dikin. Ev çanda ku em behsa wê dikin û em dikarin kokên wê bibin heta 12 hezar sal berê, kokên wê yên dîrokî di metnên nivîskî yên Sumeran de û di gelek navendên arkeolojiyê yên li herêmê de têne dîtin. Di dema vê çandê de Ewrûpa li 'serdema kevir a kevin' bû, Hindistan jî li dema 'Pîgmeyan'ê bû. Em bi hêsayî dikarin nîşan bidin ku di vê 'dema dirêj' a dîroka çand-zimanê Aryen de ji nêvî zêdetir ne kêmtirî tevahî amûrên (argumanên) ku îro jî mirovatî bi kar tîne û dijî hilbirandin û gihandine sazîbûynê. Ji bilî hin navendên arkeolojiyê yên me weke mînak diyar kirin, hînê bi hezaran jî di binê erdê de radiwestin. Her weha komên gelan ên otantîk ku îro jî hebûna xwe dewam dikin, jixwe her yek ji wan

navendeke arkeolojiyê ya zindî ye. Em van gelan di dîrokê de weke nasnameya şeş hezar sal berê hebûna wan (kengî ji alî etnîkî ve cihê dibin) dibînin. Divê ez careke din bibêjim ku heta ew tiştên li vê navenda çanda kakil (Kevana Bi Bereket) dibin û diqwimin, di her warî de wekî wate neyên derbirinkirin, wê zanista dîrokê jî xwe ji kêmasiyên mezin rizgar neke..

b- Em ji sedî sed cihê çand û zimanê Semîtîk weke rûbarokeke diherike ser çemê

mezin nikarin piştguh bikin. Ji aliyê dîrokî ve, vî çand-zimanî xwe di heman demê de cihê kir, ji dewlemendiya wî guman nayê kirin. Ji aliyê çanda şivanî û eşîretê ve belkî jî hîn zêde dewlemend e. Belkî bi vî aliyê xwe ji koma çand-ziman a Aryen pêşketîtir be. Di vî warî de di metnên Sumeran de mirov li rastî şopan tê. Di van metnan de weke du bend şivan û cotkar ên di nav pevçûn û reqabetê de ne, bi zimanekî destanwarî behsa wan tê kirin. Çiqas dişibe Iraqa îro! Di ziman û çanda wan de vegotina destanwarî serdest e. Ji ber ku xisletên yeknesak ên çolê mîna hev in, dibe ku pêkhatina xwedayê ezmên 'El, Ellah' jî li rastî vê demê bê. Heye ku weke nasnameya civaka eşîran a herê xweşik ku cara pêşî xwe bi awayekî cihê nîşan da, mîna misala bilindkirina ezmanan, têgîna 'El, Ellah' hat bilindkirin û gihişt pîrozbûnê. Durkheim têgîna xwedê weke 'nasnameya civakî' şîrove dike û mirov dikare vê şîroveyê ji bo mînakê 'El, Ellah' jî weke delîlekî destekdar ê bi hêz diyar bike. Wer xuya ye, di çanda Semîtîk de sazî û têgînên 'Şêx, Seyyîd' pirr zû bi gewde bûne. Di dema şaristaniyê de ev werdigerin saziyên 'pêxember û emîran'.

Tevî ku şaristaniya Firewnên Misrê di qada Semîtîk de cih digire, mirov nabîne ku bi kêra çanda Semîtîk hatine. B.Z. bi 4000 salan, em ti nîşaneyên maddî, têgîn û saziyan nabînin ku çanda şivantiyê rê li ber çandê welê mezin a bajarvaniyê vekiriyê. Jixwe belgeyên Misrê jî vê çandê ji xwe re gelekî xerîb dibînin. Zimanê herdu çandan jî naşibin hevdu. Çanda Semîtîk di qonaxa berê pêşî de B.Z. li derdora 2500 salan bi nasnameyên Aqad, Babîl, Asûr, Kenan û Îsraîlê di dîroka

nivîskî de cih digire. Nasnameya Ereb piştire B.Z. li derdora salên 500î weke nav xuya dike. Sumeran navên weke Aramî, Aramît û Apîrû li wan kirin.

Pir şîroveyên xurt hene ku dibêjin; Fenîke, Filistîn û heta Îsraîl piştire di nava çand û zimanê Semîtîk de (mîna çanda Firewnên Misrê) heliyane. Ji deryayê ve dest pê dikin û bi çanda Aryen re di nav hev de ne. Belge hene ku piştrast dikin, wan di nava pêlên koçberiyê yên Semîtîk de rengên xwe yên xwezayî yê destpêkê ji dest dane.

Semîtîkan gelek caran pêl bi pêl êrîş birine ser qada çand û zimanê Aryen an jî koçî devera wan kirine. Di vî warî de çavkaniyên Sumeran, gelek tomarên arkeolojîk û hinek bermahiyên otantîk ên hînê berdewam in têra xwe belge û delîlan pêşkêş dikin. Vê êrîş û mêtîngeriya mirov dikare bibe heta B.Z. bi 5000 salan, nemaze li gorî rêzê Aqad, Babîl, Asûr, Aramî û Ereban li Mezopotamya Jor şopên mêtîngeriya xwe hiştine. Ereb bi Îslamiyetê re bi xwe re asîmîlasyoneke dijwar dibin deverê. Îslambûn û Erebbûn di zikhev de dimeşe. Li dijî vê dagirkerî, mêtîngerî û asîmîlasyonê, ziman û çanda Aryen gelekî xurt li ber xwe daye, car caran bi êrîşan bersiv daye, dagir kiriye, û heta carinan karîbûye yên hember bike mêtîngeh û asîmîle bike. Di vî warî de ji dîrokê mînakên mirov bide û tene zanîn hene, damezrînerên pêşî yên şaristaniya Sumeran, pêşiyên şaristaniya Misrê, Hîksos û Îbranî ji wan in. Şiroveyeke herî nêzî pejrandinê ye ku di dewra Til Xelef (B.Z. 6000-4000) a çaxê herî pêşketî yê çanda kakil a Aryenên li Mezopotamya Jorîn de, dema pêşiyên Sumeran ên destpêkê ji Mezopotamya jorîn ber bi Mezopotamya Jêrîn koç dikin, çanda wê jî bi xwe re dibin û wê wer pêş dixin û derdixinin qonaxek jortirîn. Ev şîroveya herî nêzî rastî û qebûlê ye. Baş tê zanîn ku bandora zimanê Aqad, Babîl û Asûran piştire li ser ziman û çanda Sumeran bûye.

Divê mirov Sumeran ji komên koçkirî wêdetir weke belavbûna çanda serdema Til Xelef bi nav bike, ev yek wê ji bo şîrovekirineke rast a dîrokê hînê zêdetir bi kêr bê. Heye ku hin koman ji devera çanda

Aryen koç kiribin. Lê faktora bingehîn a bi bandor, belavbûna çanda herî bi hêz e ku wê demê di serdema xwe ya herî bi hêz de ye. Carnan tê îdîakirin ku bandora Asya Navîn û Qefkasan bûye, ev îdîayeke tewş e. Ji ber ku di serdema damezrandina Sumeran de (B.Z. 5000) ev deverên behsa wan tê kirin hînê di serdema kevir a kevin de ne, û çanda Aryenî hînê nû nas dikin. Jixwe ji aliyê naverok û şêweyê ve di wê astê de nînin ku bandorê li çanda Sumer bikin. Ji ber ku çanda Sumer ji ya wan gelekî pêşketîtir e, û ji aliyê naverok û şêweyê ve ji wan xurtir e. Her weha hêza wan nîne û ewqas ne pêşketî ne ku nifşê çand-zimanê Aryen bibihurin. Bêguman rast nîne ku mirov çandan safî bifikire, ji ber ku ketina wan a navhevdu her tim gengaz e, dibe ku hin koman ji Asya Navîn û Qefkasan koçî nav nifşên Sumeran kiribin, çawa ku îro gelek kes diçin DYE û Ewrûpayê, wê demê jî hin koman xwe li Kevana Bi Bereket girtibin. Ji gelek deverên dinyayê ji gelek qadan komên çandê yê cihêwaz û xizan îro berê xwe didin Ewrûpayê û li wir bi cih dibin. Çawa ku çanda îro ya Ewrûpayê li her devera dinyayê belav dibe, çand û zimanê Aryen jî nemaze di warê sazîbûn û zêdebûna şêniyan de bi taybetî piştî dema Til Xelef B.Z. 6000-4000î derfet û îmkanê belavbûnê dide. Koçkirina nava wan jî em dikarin bişibînin koçên xizanan ên ber bi nava Ewrûpayê.

c- Girîng e ku mirov newala Nîlê weke devereke girîng a çandê rast şîrove bike. Li vê newalê pêşketina çanda cotkariyê û gihiştina wê ya şaristaniya Firewnên Misrê, dike ku ji çand û zimanê Semîtîk re xerîb bimîne. Jixwe wer xuya ye ku naveroka çanda Semîtîk di wê qabîliyetê de nîne. Rengê zimanê Misrê bi tenê cihêwaziya xwe ji zimanê Semîtîk nîşan dide. Ji ber ku di navê de faktorên Semîtîk nînin. Hînê li başûr çandên li Sûdan, li Etiyopya û deverên din ên Efrîkayê di wê hêzê de nînin ku serdema kevir a kevin derbas bikin. Ji lewra ji aliyê teorîk ve mumkîn xuya nake ku ew rê li ber çanda Misrê vekin, ya rastî wisa jî nayê fikirîn. Dîsa ji aliyê teorîk ve kes nafikire ku komên ji qebîleyên Efrîka koç kirine li newala Nîlê rê li ber pêşketinê vekiribin. Ji ber ku ji bo vê, hewcedariya wan bi amûr û berhemên şoreşa cotkariyê hene. Em ti şop û nîşaneyan nabînin ku nebateke çandiniyê ya li Kevana Bi Bereket li newala Nîlê

xweber şîn hatibe. Di warê heywanan de jî em ji bilî kera Misrê ti tiştê din nabînin.

Li gorî feraziyezên teorîk çanda Aryen a li gelemperiya dinyayê belav bûye, mirov difikirîne ku di heman demê de şaxekî wê xwe gihandibe vê deverê jî. Divê neyê jibîrkin ku Rîfa Rojhilatê Efrîkayê nêzî Newala Nîlê ye û çawa ku mirovan ji başûr ber bi bakur ve koç kiriye, ji bakur jî ber bi başûr ve koçkirina mirovan mumkîn e. Çandên bi hêz timî bi van rêyên kevin tesîrên xwe belavkirine. Şaristaniya Misrê li salên 4000î B.Z. rast tê, çawa ku pêngava li Kevana Bi Bereket rê li ber çanda Sumer vekir, heye ku ber bi salên 5000î B.Z. bi aliyê vê deverê ve jî belav bûbe. Naverok, şêwe, derfetên çûnûhatinê rê didin vê yekê. Jixwe li ser heman rêyê di serê salên 2000 B.Z. de Hîksos, piştî di salên 1700 B.Z. de Îbraniyan (bi qasî ku dîroka nivîskî tespît dike) li Misrê koloniyên xwe çêkirin û heta asta rêveberiyê bilind bûn ku ev mînak jî fikra me piştrast dike. Herçend hêza belavbûnê ya çanda devera Aryen qels bibe jî çûna deverên Semîtîk a vê çandê wê paşê jî dewam bike.

d- Piştî ku çanda Aryen li Kevana Bi Bereket bi ser ket û saziyeke xurt çêkir, di belavbûna ber bi Îran, Afganistan, Pakistan û Hindistana îro de gelekî bi tesîr bû. Em careke din dubare bikin ku ya koçî van deveran dike ji mirovan wêdetir çand e, ango ne koçên fizîkî bandorên çandî ne. Em tesîrên pêşî yê koçberiya çandê li zozanên Îranê 7000 sal B.Z. dibînin, li Hindistanê jî li derdora 4000 sal B.Z. destpêkiriye bi tesîr bûye. Li zozanên Turkmenistanê jî ev tesîr li salên 5000î B.Z. xuya dike. Mirov difikire ku rihêştî(koka) çandên berê yê kevin binyat Efrîkî ne, û di serdema kevir a kevin de hînê çikiyayî mane. Bermahiyên çandî û rengên fizîkî yê hin koman (bi taybetî li Hindistanê) vê tezê xurt dikin. Delîlên pratîk û teorîk ên ku mîna li Misr û Sumerê hebûna pêşketina çandê berhema pêşketina xwecihî ye, piştrast dikin nînin.

Herçend hin rexne vî şêwazê fikrê reduksiyonîst bihesibînin jî divê ez bi taybetî bi bîr bixim ku di dîrokê de şoreşên çandî gelekî kêr çêdibin û

pirr bi zehmetî pêk tîn. Em li çanda Ewrûpa bifikirin. Mînaka wê li ti deverê nîne. Mirov fikreke bi heman rengî ji bo çanda li Kevana Bi Bereket a li gorî dema wê pêşkêş bike, têra xwe fikreke afirîner e. Ji komên li ber îmhakirinê û di nava tebîetên xwe yên hezar salan de asê mayî, mirov nikare şoreşa çandî hevî bike û mirov nikare wê hêjayî wan bibîne, ev yek ji aliyê fikir û bermahiyên çandê ve jî destekê nabîne û nayê pejirandin. Belavbûneke çandî ya ber bi rojhilat ve di salên 3000 B.Z.ê de li rojavayê Îranê li herêma Elamê xuya dike. Navenda wê Sûs e. Zêdetir dişibe mêtîngeheke Sumeran û fena xwe gihandibe şaristaniyeke bajêr. Ji sedî sed bandora Sumeran e. Hînê li rojhilat li Pakistana îro li kêleka çemê Pêncavê (Pençab) damezrîna bajarê Harappa û Mohanjadaro jî li salên 2500 B.Z. rast tîn. Eşkere ye, ev avahî li ser şopên Sumeran e. Nabe ku mirov bi toeriyên beravêtî van çandan weke avahiyên orjînal ên çandên din bihesibîne. Ji ber heman sedemên tîne zanîn em wisa nafikirin. Tebeqeya çandî ya jê re resen (orjînal) tê gotin hema bêje di astekê de ye, dişibe 'Pîgmeyan', eger mirov ji wan şaristaniya bajêr a orjînal çêke, mîna ku mirov kerê hesp bifikire. Divê ez bi bîr bixim ku bi hezaran komên jiyana wan mîna hev û di heman astê de, bi mîlyonan salan li herêmên cografîk ên hînê pêşketî nikarîbûn heman şaristanî û şoreşên çandî yên mezin pêk bînin. Ji bo fikra me were fêhmkirin, bawer dikim ev yek têra xwe mirov hîn dike.

e- Ya hînê girîng ew e ku mirov têkiliya di navbera koma çand-zimanê Hind-Ewrûpî û koma çand-zimanê Aryen de rohnî bike, belkî jî ev yek ji pirsgirêkên bîngêhîn ên zanista dîrokê ye. Li ser vê têkiliyê gelek spekulasyon tîne kirin, lê ew yek ji wan xeletan e, li ser wê şîroveyeke hevpar çênabe. Di sedsala 19.an de wexta hevpariya komên ziman ên Hind-Ewrûpayê hatin fêhmkirin, dest bi lêkolînên mezin kirin. Li ser çavkaniya dayik a koman, der barê 'çand û zimanê pêşyan' de şîroveyên nakok hatin kirin. Li ser kok û rîşên van çandan gelek tişt hatin gotin. Hinek ji wan kok gihandin Yewnanan, hinan Hind, û heta hinan gihand Bakurê Ewrûpayê, hinan ji wan jî birin heta Elmanyayê. Lê piştî ku cihêbûna ji prîmatên (ruhberên berî mirov) li Rîfa Rojhilatê Efrîka û şoreşa

cotkarî-neolîtîk a li Kevana Bi Bereket îspat bû, feraziyên behsa wan hat kirin, bi tevahî têk çûn. Herdu deverên navbihurî di dîroka mirovatiyê de gelekî girîng in ku me hewl da vê yekê bi kurtî û xulase rave bikin.

Guftûgoyên li ser otantîkbûna komên çand û ziman ên li Kevana Bi Bereket niha girîngtir bûn. Bi awayê em şîrove dikin komên 'Aryen' yên ji proto-Kurd, Fars, Afgan û Belûçiyên di vê guftûgoyê de li rêzên pêş cihê girîng digirin. Nemaze rengê zimanê Hûrriyan ku proto-Kurd in, diyar bû, aîdiyeta çand-zimanê Aryen ê xwe dispêre gelên otantîk zelal bû. Teza ez bi xwe jî rast dibînim ew e ku herêma kakil a şoreşa neolîtîkê tenê bi vê çand û zimanê çêdibe. Herêma kevana jî ji sîstema Toros-Zagrosan pêk tê û weke Hîlala Bi Bereket jî tê bi navkirin. Zelal bû ku ev herêm jî navenda çand-zimanê Aryen e. Xebatên etîmolojîk, erdkolanên arkeolojîk ên dawî û qiyasên di warê etnolojîk de her roja derbas dibe vê tezê hînê zêdetir xurt dikin. Bi vî awayî pirsgirêka çavkanî û jêderê ya ji koma ziman û çandê ya Hind-Ewrûpayê re pêşengî kiriye bi giranî çareser bû.

Ji ber ku 'dem' dirêj e, û cografya pirr fireh e, zêde rast nîne ku mirov nexşeya belavbûnê ya çand-zimanê Aryen hema weke tê gotin bide. Lê bi hêsayî mirov dikare şîrove bike ku belavbûneke mîna ya ber bi başûr û rojhilat ve ber bi bakur û rojavayê Ewrûpayê ve jî pêk hatiye. Bi giştî ya tê qebûlkirin ew e ku li derdora 5000 sal B.Z. vê pêla belavbûnê destpêkiriye û B.Z. di salên 4000î de ber bi Rojhilatê Ewrûpayê, B.Z. di salên 2000î de jî bi tevahî ber bi Rojavayê Ewrûpayê belav dibe û bi cih dibe. Di serî de Gordon Childe dîrokên girîng dîroka Ewrûpayê dispêrin van salan. Jixwe beriya van salan 'serdema kevir a kevn' e. Homo Sapiens sîh hezar sal berê li navbera Spanya û Başûrê Franseyê îro cinsekî serwer bû ku ji Bakurê Afrîkayê belav bûbû. Tê texmînkirin ku di encama vê belavbûnê de herî zêde dema mezolîtîk 'serdema navîn a kevir' hatiye jiyîn.

Em di wê rewşê de nînin ku şoreşa cotkarî û neolîtîka Ewrûpayê lêbikolin. Lê ez bawer dikim ku ji ber giringiya xwe pirsgirêka çavkaniyê hatiye zelalkirin. Dîsa ez texmîn dikim ku belavbûna li vir ne

li ser bingehêkî fizîkî û kolonî, lê li ser bingehê çandî pêk hatiye. Di vê mijarê de xweseriya Ewrûpayê ev e: serdema Neolîtîk tevî aliyên wê yên afirîner hemû li ber destê xwe têkûz dîtiye û girtiye. Ewrûpa xwedî wî şensî bû ku deh hezar sal tev bi carekê yan jî di demekê de ku mirov dikare kin bihesibîne, karîbû dawerivîne hinavê xwe. Dikare bê gotin, çawa ku Ewrûpayê dinya çarsed sal e kiriye qada belavbûnê ji bo çanda xwe, ew bi xwe jî berî şoreşa Neolîtîk, hînê paşê jî ji bo şaristaniya Romayê û şoreşa ruh-mane ya Xiristiyantiyê bûye qada belavbûnê. Hersê şoreşên mezin zêdetir li ser hîmê çandî li Ewrûpayê belavbûne. Belavbûn ji bilî çend şerên împaratoriya Romayê bi mêtingerî, kolonîti û asîmîlasyona bi darê zorê nebûye. Çandên jor û bilind weke 'dayîna xwedê' ji dil hatine qebûl kirin. Piştî ku Ewrûpayê bi vî awayî xwe gihand çanda mirovatiyê ya deh hezar salan ketiye serhev, hînê piştî hîmê şoreşên mezin ên Ewrûpayê (Ronesans, Refermasyon û Rohnîbûn; şoreşên Polîtîk, Îndustriyel û Zanistî) hatin danîn. Ewrûpayê bi qabîliyetên xwe yên taybet ev şoreşên mezin nekirine. Çemê Mezin ê dîrokê û şaxên wî bi hev re weke şîpekê herikîne û bi vî awayî Ewrûpayê karîbûye hîmê xwe deyne. Bêguman di heman demê de 'serdema qeşa' xwe vedikişîne, bi vê re bi saya av, ba û hewayê daristanên teze, hêşîn û erdên bi bereket li Ewrûpayê çêbûn. Ewrûpayê bi sentêza van şertan hemûyan karîbûye gav biavêje vê şaristaniya mezin a mohra xwe li roja me ya îro xistiye.

Kurd û Çaxê Bendetiyê

Di belgeyên nivîskî yên Sumeran de bi awayekî bihêz hatiye vegotin ku di dema ku dîrokê bi awayekî nivîskî despêkirîye de, civatên ku binyat Kurd in di dîka dîrokê de risteke sereke listîne. Heke dahurandîneke baş li ser wan belgeyan bê kirin, têrê hene ku mirov têbigihêje ku Sumeran behs ji komên binyat Kurd ên cînarên xwe yên ku herê pir wan nav lêkirîne, kirîn e. Sumeran navên wekî Horrî, Gutî, Kassî li wan kirine, dema ku mirov bi awayekî etîmolojîk li ser hûr û kûr bibe, mirov dê bi awayekî pir baş û vekirî bibîne ku ji bavkalkên Kurdên niha behs kirîne. Horî tê wateya 'gelê memleketên bilind', Gutî (Gud-jî Ga ye, niha jî Kurd hê jî di wê wateyê de bikar tînin.) jî tê wateya 'civatên gel ên bi dewar'. Kasî jî ji kedkarên hejar ên ku ji heman koman in û li bajarên Sumeran niştecih bûne re tê gotin; ji beşên ku bi erzanî karmendî û pîşekariyê dikin re tê gotin. Dîroka Sumeran û ya

wan koman çî qas di nav hev de ye baş tê zanîn. Bi taybetî jî li hember Akad û Babîliyên ku binyad Semîtîkin hevgirtina bi Hûrî, Gûtî û Kassîtan bingeh girtîne. Bi hev re Xanedana Sargonê Akadî hilwişandîne. Di heman demê de jî demeke dirêj Xanedanên Gûtî û Kasîtan bajarên Sumeran birêve birîne.

Dema ku mirov li binyada çand û zimanê Sumeran binêre, mirov wê bi hêsanî bibîne ku hemû amûrên(donanim) xwe yê teknîkî ji Hûrîyên afirînerên çaxa neolîtîk a tejeneya (havza) jor a Firat, Zap û Dicle girtîne. Têgînên mîtolojîk, agahîyên bingehîn jî bi piranî ji heman çandê girtin e. Gelek pêşgir û hêmanên mêtîyê jî yê di zimanê Sumeran de, ji heman çandê hatîne girtin. Gelek destan û helbestên Sumeran jî, ji hêla naverok û teşeyê ve, heta niha jî hebûna xwe di nava çanda êlên Kurdan de didomîn e. Lêhanîna destana Dervîşê Avdî jî, çavkaniya xwe ji nivîsên li ser tabletên Sumerîyan ên 2000 sal B.Z'ê digirin. Heman tişt li herêma Sincarê ji hêla keçeke nediyar ku wekî GÎRO tê binavkirin ve jî, li ser navê lehengekî gel hatiye gotin. Di navbera helbesta Giro ya ku 2000 sal B.Z.'ê hatiye nivîsîn û destana Derwêşê Evdî ya îro de, ji hêla gotin û teşeyê ve hevşibîneke pir balkêş derdikeve holê. Mirov li rastî gelek belgeyên ku dişibin vê tê. Li ser girêdana di navbera kulta xwedawenda Înanna-Îştâr û Stêrkê hate rawestîn. Taybetiyên destana Gilgamêş û Tofana Nûh jî, hevşibînên bi heman rengî di xwe de dihewînin. Ya rastî dema ku mirov bi awayekî hûr û kûr lê binêre, wekî ku ji rewşa Iraqêya îro tê fêmkirin, dîroka Sûmeran jî ji hevgirtin û li hev xistinên cihê yê ku di navbera çiyayîyên bilind Hûrîyên Aryenî û Amorîtan (di wateya 'yên ku ji rojava hatin'e) pêk tê. Her çiqas civatên Sumerîyan li gorî xwe , ji xwe re zimanekî cihê derxistin jî, lê ew ziman ji gotinên binyat Aryenî û Semîtîkî ku çavkaniyên wî zimanî yê herê mezin in, têrtijî ne. Jixwe jîholêrabûna wan jî, ji ber pêşketin û bilindbûna şarîstaniyên binyad Hûrî û Amorîtan ên ku ji devdora wan bilind bûne ye. **Daha doğrusu Sümerler, varlığını borçlu oldukları bu iki kültürel grubun sınıflı topluma dayalı uygarlık sürecine girmeleriyle ayrılmakta; bu toplulukların hakim hanedanlıklarında dönüşerek varlıklarını sürdürmektedirler.** Ji holê ranabin, lê neçar dimînin ku hebûna xwe di bin sîvana xanedanên xwedî çandên cihê û ciwan de bdomînin.

Ev kurte pênase bi tena serê xwe jî, dide diyarkirin ku dîroka Sumeran û ya Hûrîyên cîranên wan, ku bi awayekî herî bihêz girêdana wan û

ya Kurdan hatiye peyîtandin, din ava hev de ye. Dîrokeke hepar mijara gotinê ye. Bi vî awayî çavkaniyeke herê girîng a dîroka Kurdan, bi diroka Sumerên ku dîroka nivîskî destpêkirîne re di nava hev de ye. Têkiliya vê dîrokê a bi çîya ve, ya bi hemû hêmanên çandî yên ku ji çîya hatî n ve, lihevda û têkiliyên wan ên berbiçav, bandorkirin û pê bandor bûn, di heman demê de dîroka civatên binyad Kurd e jî.

Di van demên dawiyê de li rastî gelek belgeyên ku bi zimanê Hûrî hatîne nivîsîn hatîne. Belgeyên ku di bajarên Nûzî, Ûrkîş û Hîtî de hatîne peydakirin, di derbarê Hûrîyan de agahîyên berfireh didin.

Tê dîtîn ku Hûrî berdevama civatên ku 6000 sal B.Z. 'ê neolotîk gihandîne sazîbûyîne û teşe dayîne çanda Til Xelefê ne. Me dabû diyarkirin ku 3000 sal B.Z. 'ê cara yekemîn Sumeran navê Horrît ku tê wateya 'çiyayî' li Hûriyan kiribû. Tê texmînkirin û her ku diçe ev yek tê peyîtandin ku ew civakên piştî higa wekî Gûtî, Sabarî û Kassîtî hatîne binavkirin, di dem û cihên cuda de derketîne holê û heman çand û ziman bikaranîne û parvekirîne. Îro jî heke navên cihê li gelek êl û eşîrên cuda cuda hatibe kirin, nayê wê wateyê ku ew êl ne ji heman koma glekî ne. Bi sedan navên cihê lêkirin, karektera civakan a hevpar naguherîne.

Binyata zimanê Hûrîyan Aryeni ye. Hatiye peyîtandin ku gelek gotinên ji vê binyatê derbazî zimanê Sûmeran bûne. Bi taybetî navê dexlûdanan(tahil) û lawiran, ji Hûriyan derbazî Sûmeran bûne. Di gel vê yekê navê keştiya çolê anku navê devê binyad Smîtk e. Nav û heyîna gelek amûrên çandinê jî ji Hûriyan derbazî Sûmeran bûne. Ji hêla mîtolojiyê ve jî Hûriyan bandor li Sumeran kirîne û mirov dikare bi hêsanî bi angaşîne ku divê qadê de jî, gelek têngîn derbasî Sûmeran bûne. Têgihîştina ol û mîtolojiyê jî ya ku xwe dispêre ezmanan, çavkaniya xwe ji Hûriyan digire; lê ji ber ku wekî civak hêj senifandina xwe ya çînayetî tamam nekiribûn, jiyaneke wekhev û azad vedibeyandin. Tabetiya dayîka xwedavend serdar e. rahîbên Sumeran di van girikên ku jê re digotin 'ûr' de ew kereseya.(malzeme) daringî û giyanî(madî manevî) anîn ba hev û sentez kirin, kirin xîmê bingehe civaka çînyatger. Di wê yekê de jî bi serkeftî bûn.,

Wek mijarek dawiyê, gelek daneyên ku didin peyîtandin ku Hûrî bavkalkên Kurdên îro ne, têne hijmartin. Di serî de hevşibîna di binyada zimanê wan de tê. Hê jî gelek peyvên ku têne bikaranîn ji heman rayekê pêk hatîne. Di belgeyên kolyarnasiyê(arkeolojîk) yên ku

li pey xwe hiştî ne de, dide diyarkirin ku di vê qadê de ji B.Z. 'ê bi 11 hezar salî û vir ve, du çandan bê navber hebûna xwe domandîne. Ti tomareke ku li hember pêlên fîzîkî yên ku ji derve hatîne, jiholêrabûna wan didin diyarkirin tine ne. tam berevajiyê wê yekê, heta roja me ya îro jî, carna bi lihevexistin û carna jî bi lihevkirina bi cîranên xwe re, hebûna xwe parastîne û anîne; ev dîtineke ku ji hêla hemû pisporên mijarê ve tê pejirandin. Wekî ku di her civakê de dibe, di hemû gihanekên dagerînê (dönüşüm aşamaları) yên dîrokê de guherînên ku di wan de jî çêdibin taybetiyeke ku tê payîn. Ev, nayê wê wateyê ku tinebûne an jî bi tevayî hatîne guherîn. Navlêkirinên cihê û cudatiya di navber zaravayan de jî, ji bo hemû komên çandê jî lê ye. Di be ku, di vê hêlê de çanda civakên Hûrî bi awayekî serkeftî heta roja me ya îro jî, di rewşa çandek herê safî û zelal de maye. Hûriyan di astek herî bilnd de bi awayê êlan hebûna xwe didomandin. Di vê yekê de taybetiyên civaka neolîtîk û dagikeriya ji derve hatî xwedî bandorek mezin in. Taybetiyeke din a tê zanîn jî eve ku gelek caran bi avakirina kofederasyona êlan bûne nîvdewlet jî. Ji mînakên Ûrkîş, Nûzî, Ûrfa û Semsat tê fêmkirin ku demekê piştî koloniyên Sumeran bûne xwedî dewletên navendî yên bajaran jî. Lê tê dîtin ku di eyara Sumer, Misir û Hîtîyan de nebûne xwedî hêza împaratorîyek navendî.

Li hemberî raseriya (üstünlük) Hîtîtan her çiqas ketibin zorê jî, lê bi pîranî yekîtiyeke wan a di encama lihevkerinê de çêbêyî jî hebûye. Bi wê yekîtiyê B.Z. 'ê di sala 1595 de Babîl xistîne bin destê xwe. Di dîrokê de piştî wê pêvajoyê B.Z. 'ê di salên 1500 'î de li cihê Hûriyan bi navê Mîtaniyan xanedaneke din a lêzimên wan li ser dikê hespê xwe bezandine.

Mîtaniyan, ji valatiya ku piştî bi hev girtina Hîtîtan û Hûriyan dawî li împaratoriya Babîlan anî derketî holê (ku B.Z. 'ê di salên 1600 'î de Babîl di dema xwe ya herê bi heybet de bûn) sûd wergit û cihê xwe li ser dika dîroke girtin. Paytextê wan Xweşkanî ye. Tê texmînkirin ku li Serêkaniya a niha, hatiye damezirandin. Hem ji belgeyên lihevkerinên wan ên bi Hîtîtan re hem jî ji nameyên ku ji Fîravnen Misrê re şandî tê fêmkirin ku zimanekî ku dişibe zimanê Hûriyan bikaranîne û ji koma zimanê Arî ne. Li binê hevpeymanên ku bi Hîtîtan re kirîne, li ser navê xuda Varûna, Îndra, Mîtra û Nasatya sond xwarîne û şanên kirîne, ew jî dide diyarkirin û di peyîtîne ku wan jî heman ol û mîtolojîya ku koma Hînt-Awrupa hebandî hebandîne. wisa tê

fêmkirin ku Hûrî, Hîtî, Mîtanî û Lûwiyên ku li Başûrê Rojavayê Anatolyayê dijiyan xwedî ziman û çandê ku di şibîn hev bûn. Çiqas deverîbûn kûr û zêde dibin cihêtî jî ew qas pêşdikeve. Di bingehe wan de jî çanda neolotîkê a ku di bin navê Aryen de bûye têngîn radizê. Dema ku komên gel ên li herêmên cuda cuda li rastî wê çand û têngînên ziman tên, li aliyekî hem hevşibîn û ji aliyekî ve jî jihev cihêbûn pêş dikeve. Têkiliyên Mîtaniyan ên bi keyîtiya Misrê re di asta dewletê de ne. diyariyan didin û distînin. Bi Hîtîtiyan re jî heman tişt mijara gotinê ye.

Ji hêla Asuriyan ve ji holê rakirina Mîtaniyan, di herêmê de rê li ber blok û federasyonên nû vekir. Di vê navberê de di destpêkê de federasyona Naîriyan xwe dide diyarkirin; welatê wan ji hêla Asuriyan ve wekî 'welatê avê' tê binavkirin ku geliyê Dicle, Firat û Zapê digire nava xwe. Naîrî di rewşa federasyonê ku bi sedan êlan pêkhatine jiyan e. Lê gelek caran belavbûne û careke din hatîne ba hev. Her çiqas Asuran ew xistibin bin venêrîna xwe jî, lê ti caran nekarîne li ser wan tam bibin serdar. Nivîsên Asuran ên ku li ser kevîran hatîne nivîsîn bi awayekî herê balkêş dide diyarkirin ku gelek caran serî hildane û xwe hilkişane herêmên serhildanê. Em ji wan nivîsan dixwînin û baş têdigihêjin ku çanda serhildêriya êlên Kurdan bi hemû taybetmendiyên xwe ve ji bo wê demê jî lê ye.

Ev yekîtiya êlan a ku nave Naîrî lê hatî kirin, B.Z. 'ê di salên 900'î de bi navê Ûrartûyan dewletekê avadikin û derdikevin ser dika dîrokê. Ûrartûyî bi navê Tûşpa li bajarê Wanê ji xwe re paytextekî ava dikin û digihin pêşketineke di asta Mîtaniyan de. Di hêla meden û xwedîkirina hespan de xwedî derfet û pêkanên berfireh in. Di dirokê de cara yekemîn wan cokeke avê –ku dirêjiya wê nêzî 52 kîlometran e- ji Nûrdizê(Gürpınar) heta Wanê vekirin. Heta roja me ya îro jî ji wê cokê sûd tê wergirtin. Tê fêmkirin ku gelek bajar, bent û kelevakîrîne. Ûrartûyî, li aliyê bakur heta çiyayê Agirî digirin. Wek gelê bingehîn, ji dûmahîyên Hûriyan û Xalidiyên ku tê texmînkirin nêzî Ermeniyên in pêk tê. Bigiranî binyat Hûrî ne. wek zimanê fermî Ûrartûyîya hem nêzî Asûrî û hem jî nêzî Hûrî bikartînin. Çava ku di roja me de Îgilîzî zimanê dîplomasiyê ye û hê jî gelek dewletên mêtîngêh bikartînin, Asuriya ku xwe dispêra Akadiyê jî demek dirêj zimanê hevpar ê dîplomasiyê û çandê yê herêmê bû. Zimnê Asûrî jî vê kevneşopiyê didomîne. Piştî ku Asûrî hatin hilweşandin û şûnde, vêca zimanê Aramiyan dê wê kevneşopiyê bidomîne. Lêbelê êlan ti caran

ew ziman bikar nehanîne, her tim zimanê diya xwe bikaranîne. Bes, beş û tebeqeyên jor ên hevkar zimanê fermî yê serdetan bikaranîne. Di her dem û herême de pêvajoyên ku dişibin vê hatîne jiyankirin. Gelan her tim çand û zimanê xwe parastine û bi vê hebûna xwe jiyane, lê tebeqeyên jor ên hevkar her tim di jiyana xwe de bi giranî ziman û çanda biyaniyên dagirker bikaranîne. Hîtî, Mîtanî, Îbranî û dewletên din ên nû ku dişibin wan dikevin bin bandora çand û zimanê serdest ê Sûmer û Misriyan, xanedanên serdest ên wan dewletan bikaranîna çand û zimanê Sumer û Misriyan ji xwe re weke cihêtiyeke pir mezin dinirxînin. Mixabin di roja me de jî pêvajoyên ku dişibin wê hê jî çalak in. Li hemberî vê yekê jî her tim gelan çand û zimanê xwe yê neteweyî li piştta xwe kirîne û parastine.

Wekî encam;

Ravekirin û terîfeke civaka kurd hîna hêsantir e. Gelê Kurd û lawir xwedîkirin, cotkarî û çiya heman tişt in. Bajarvanî weke têgeh ji Kurdan dûr e. Belkî jî gundîtî di dîrokê de rastiyeke civakî ye ku pêşiyên Kurdan pêk anîne. Kurd çendîn gundî û koçer bin, ew çend jî ji bajarvaniyê dûr in. Komagene pir baş rave dike ku niv-gundîtî niv-koçertî nîzama tevgerê û cih û warê hezar salan ê Kurdan e. Bajarên wan jî zêdetir, dagirkeran ava û tijî kirine; lê ev yek nayê wê wateyê ku Kurdan bajar ava nekirine û nebûne xwediyên şaristaniyan. Di serî de dewletên Urartu, Med û Mîtan, tê zanîn ku bûne xwedî gelek bajar û şaristaniyan. Di serdema navîn de têra xwe bajar û hikumetên eyaletan avakirine. Lê ji ber ku dewlet û hikumdarên ku avakirine, temendirêj nebûne, bajar zêdetir bûne biryargehên hêzên dagirker û ji civakên hawirdorê pêk hatine. Di serdema seretayî de Sumer, Asur, Aramî, Pers û Helen muhira bandora xwe li ser berhemên çandî û nivîskî dixînin. Lê di serdema navîn de ziman û çanda Farisî û Erebi şopên xwe hiştine. Gelek rewşenbîr, dewletdar û fermandarî bi vî ziman û çanda cîran ve rol lîstine. Tevî ku çand û zimanê Kurdî xîm û kokeke wî ya kevnare heye jî bi sedema ku kêmbûyê zimanê nivîsê û nebûyê zimanê dewletê, nekariye belgeyan li dawîya xwe bihêle û bi pêş bikeve. Dîsa jî çanda Kurdî bi riyên cuda, bi hebûna xwe ya etnîk a dijî û berhemên dîrokî heta roja me ya îro tê. Çand û zimanê Kurdî, bi ihtimaleke xurt ku –gelek arkelog vê dîtîne parve dikin- weke çand û zimanê yekemîn şoreşa neolotîkê li qûntara çiyayên Zagros-Toros

daye destpêkirin. Bi demê re bingehê hemû çand û zimanên koka wan Hint-Ewrûpayî ne, pêk aniye. Tê texmînkirin ku, BZ ji salên 9000'an pê ve ne bi fîzîkî, lê bi awayekî çandî li erdnîgariya Hint-Ewrûpayê belav bûye. Em bixwe jî dikarin vê pêkhatina wê bibin heya BZ salên 15.000-10.000'an. Bi ihtimaleke mezin, bi derketina ji çaremîn serdema qeşayî (BZ 20.000-15.000) weke ziman û çanda herî xwecih -otoktan- pêk hatiye. Etnîsîteya Kurdî BZ di salên 6.000'an de êdî pir cihewaz dike. Em li ser dika dîrokê yekem car wan bi navê Huriyan (BZ 3000-2000) dibînin. Sumerî li ser daristan û madenên xwe, nişên Huriyan jî bi dewlemendiya xwe ya şaristaniyê bi hezarên salan bi tekoşîneke eşîr-parastinê li ber hev dane. Ev diyalektîka dîrokî bi Babîl, Asur, Hîtî, Îskî, Pers û Helenan re dewam dike. Belkî jî tu qewm û niş bi qasî Kurdan di eşîrên li hemberî koçer û xwecihyan de cih negirtine. Ji bo şaristaniya Sumeran bigihîje, Hîtî, Luwî, Îon û Persan rola Hurî û Medan diyarker e. Ji ber vê rastiyêye ku gelên behsa wan tê kirin, nêz-dûr ji koma zimanên Hint-Ewrûpî ne.

Di dîroka Herodot de pir aşkera tê dîtîn ku ziman û çandên bandora xwe li Helenan kirine, çavkaniyên wan Medî ne. Helenî BZ heta salên 900-400'an pir zêde di bin bandora Mediyên de jiyane. Gelek hêmanên çandî yê madî û manewî di vê serdemê de ji çavkaniyên Urartu, Med, Persan wergirtine û bi senteza xwe ve dewlemend kirine. Tê texmînkirin ku pêşiyên Kurdan Hurî (BZ 2500-1500) dîsa Mîtaniyên ku bi koka xwe Hurî ne (1500-1250) Naîrî (BZ 1200-900) Urartuyî (BZ 900-600) Medî (BZ 700- 550) di van deman de bi konfederasyonên eşîr û qraliyetan ve jiyane. Civaka Kurdan a di van deman de hiyerarşik e û derbasî dewletê dibe. Mirov dibîne ku pergaleke xurt a bavikanî danîne. Ji ber ku di serdema neolotîk a cotkariyê de jin hîna çalak e. Ji ber vê yekê di civaka Kurdan de jin xwedî giraniyekê ye. Ihtimaleke xurte ku jinê ev hêza xwe demeke dirêj bi kar aniye. Bingehê wê jî şoreşa cotkariyê ye. Hêmanên mêbûnê yê di ziman de û kulta xwedewend Starê belge ne ku vê heqîqetê piştrast dikin.

Zerdûştî BZ di salên 700-550'an de weke şoreşeke zîhniyeta Kurdan pêş ketiye. Zîhniyeta Zerdûşt xwe dispêre cotkariyê; ji heywanan pir hez dike, li ser hîmê wekheviya jin û mêr e, weke tégihîştineke exlaqî ya azad e. Ev çandek e, hem bi cihoka Persan diherike Rojhilat, hem jî bi cihoka Helenan diherike şaristaniya Rojava û bandoreke xurt li wan dike. Li ser xeta çanda Rojava-Rojhilat ji hev dibe. Bandoreke

xurt li ser herduyan jî dîke û di teşegirtina şaristaniyê de herî kêmbi qasî Musevîti û Îsevîtiyê rola civakbûnê (çavkanîbûyînê) lîstiyê. Şaristaniya Persan, a rastîn şaristaniyeke ku Medan avakiriyê û şaristaniyeke Med-Persan e, tevî nişşên Persan dewam kiriyê. Di dîroka Herodot de ev rastî pir aşkera diyar dibe. Ji serî heta dawiyê etnîka duyemîn e, hevparê împaratoriyeke ye. Di dema Sasaniyan de jî heman rewş didome. Di heman şaristaniyên Îranê de heke mirov rola Kurdan di rêza duyemîn de nebîne, wê helwesteke realîst be.

Li ser Çanda Kurdistanê Polîtîkayên Pişavtinê Yên bi Darê Zorê

Yek ji polîtîkayên civakî yê aliyên desthilatdar û şer, herî zêde serî lê dane polîtîka pişavtinê ye. Bi gotineke giştî pişavtin, helandin û bişaftina çandê ye. Aliyên desthilatdarî û şer bi polîtîka pişavtinê dixwazin komên ku di bin destên xwe de digrin, ji hêza berxwedanê bixînin û ji bo vê yekê jî amurên di desten wan de jê distînin. Di serî de li ser zimanê herêmî ku zihniyetê îfade dîke zimanê serdest tê ferzkirin. Bi rêya zimanê fermî çanda zimanên herêmî têne baskokirin (kezaxtin) û nikarin di jiyane de rol bilêyîzin. Çand û zimanê serdest weke zimanê xwendin, siyaset û aboriyê ji bo kesên ku bi kar bîne xwedî sûd e. Kesê çand û zimanê bindest jî bi kar tîne wenda dîke. Di nava vê dualitiyê de zehmet dibe zimanê herêmî xwe li dijî zimanê desthilatdariyê rabigre. Nexasim ev ziman nebîbin zimamê nivîsê û zaravayên xwe yê sereke destnîşan nekiribin. Wê demê dê dawîya van ziman û zaraveyan tarî be. Pişavtin ne tenê li ser ziman her wiha li ser hemû sazîyên civakî yê desthilatdariyê şekil dane wan tê meşandin. Ol û neteweya serdest di her astê de li gor rastiya sazîyê tê dawerivandin. Sazî heta di warê siyasî, civakî, aborî û heta zihni de bi awayekî fermî were naskirin û bi awayekî hiquqî were parastin, sazîyên hindikayîyên din û yê têkçûyî xwe li gor sazîyên serdest an bi zorê yan jî bi dilê xwe, li pişavtinê diqewimin û di nava fermiyetê de cihên xwe digrin. Zordarî aborî û berjewendiyên siyasî çiqas bikevin rojevê helandin jî ew çend zû dibe.

Li ser hebûna çanda Kurdistanê herî kêmbi qasî şer û terore pişavtina bi darê zorê roleke wêranker (texrîbkar) lîstiyê. Em dikarin heman rêbaza dîrokî pêk bînin û biçin hetanî serdemên seretayî. Heke ku em bibêjin çand û zimanê Sumerî ziman û çanda herî mezin a pişavtinê bû, divê weke gotineke nepixandî neyê dîtin. Em vê yekê ji nîzama hevok û peyvên wê fêm dikin. Berê zimanê Sumerî û li gor rêzê

Hurî, Mîtanî, Urartu, Medî û Persî, piştire jî li gor rêzê zimanê Babilî û Asurî çavkaniyên wan Aramî ne. Paşî jî Aramî di serdemên seretayî de li Rojhilata Navîn zimanên pişavtineke mezin bûn. Mirov dikare vê rastiyê di kewaleyên (kîtabeyên) Hîtî, Urartu, Mîtanî, Med û Persan de bibîne. Mîna Îngîliziya îro, zimanê Aramî jî weke “înteretrnîsîte” ya wê demê zimanê hevpar ê ji hev du fêmkirinê bû. Nexasim arîstokrasî û bûrokrasiya dewletê yek ji zimanekî zêde bi kar tîne jî zimanê Aramî ye. Zimanê herêmî tevî zimanê Aramî tê bi karanîn. Mîna ku em îro jî dijîn, zimanê fermî yê desthilatdariyê di danûstendinên fermî yên dewletê de esas tê dîtin û di wê demê de Aramî- hînê berê Akadî û Sumerî- zimanê esasî ye. Zimanên herêmî zêdetir di nava gel de ku kesên xwendin û nivîsandina wan nîne weke amurekî ragihandina devkî bi kar tînin. Mirovê vê rastiyê dikare di kewaleyên Urartuyan de bibîne. Çawa ku piraniya rêveberên welatên bindest bi zimanên Îngîlîzî û Fransî dipeyivin.

Di kewaleyên Persan de cihê Aramî aşkera ye. Di wê demê de li hemû Rojhilata Navîn hem zimanê dîplomasiyê hem jî zimanê bazirganiyê ye. Di hemû belgeyên pêwendîdar de tê dîtin ku pişavtin di mîmariyê de, di rêveberiya dewletê de, di wêje û hiqûqê de roleke mezin lîstiyê. Heta tê texmînkirin ku Îsa jî bi Aramî zanibûye. Zimanê Suryanî ku şeweyekî neteweyî yê Aramî ye, amurekî din ê pişavtinê ye. Wê demê zimanê Îbranî hêjî di qadeke bi sînor de xwedî bandor e. Lê Helenîzm ji ber ku di rewşa dijber de belav dibe, zimanê Helenîzmê li Rojhilata Navîn xwedî bandor e; mîna Îngîlîzî û Frensiya îro. Helenî û Suryanî jî bi hev re di riyekê de ne. Her du jî li Kurdistanê, nemaze li bajaran ji bo bitesîr bibin têdikoşin. Rûha ji bo vê yekê mînakeke xweser e. Aramî çandekê kûr e ku Ermenî, Suryanî, Erebî, Kurdî û herî dawî jî Tirkî jiyaye. Lê belê di heman demê de rê li ber pişavtineke dijwar û kozmopolîtîzmeke zêde vedike. Mirov ji rewşa îro ya Rûhayê vê rastiyê baş dikare fêm bike.

Rola zimanê Suryanî di çanda Kurdistanê de ji Erebiya paşî li pêştir e. Mirov dikare bibêje weke zimanê ronîbûnê rol lîstiyê. Ya esas ji ber ku Suryanî li bajaran rûdiniştin, ev encam derdikeve holê. Kurd weke xelkê Komagene zarava û zimanê devkî yê koçerî û gundîtiyê bi kar tînin. Çavkaniyên wan ên nivîskî bisînor in, lê nayê wê wateyê ku qet nîn in. Nemaze li paytexta Mîtaniyan Waşukaniyê (li ser sînorê îro yê Suriyê-Tirkîyê bajarê Serekaniyê û Amûdê) gelek belgeyên nivîskî

nîşan didin ku BZ di salên 1500'an de proto-Kurdî weke zimanê nivîsê hatiye bikaranîn.

Li Kurdistanê BZ di salên 300-250'an de di heman qraliyetên Helen de hebûna xelkê bi koka xwe Helenin, nemaze giraniya wan a li bajaran nîşan dide ku zimanê Helenî demeke dirêj hatiye bikaranîn. Mîna rola zimanekî metîngeriye rol dilîze. Mîna di roja me ya îro de bajarên Kurdistanê bi çand û zimanên biyanî dijîn û xelkên li derveyî bajaran jî bi çand û zimanên xwe yê herêmî dijîn.

Bi Îslamiyetê re zimanê derdikeve pêş zimanê Erebi ye. Erebi ku berê zimanê bedewiyan bû, bi bajarbûn û derketina Îslamiyetê re li Rojhilata Navîn bû zimanê herî xwedî prestîj ê zanist û wêje yê. Erebi weke zimanê fermî yê desthilatdar û şer serdestiyeke mezin bi dest xist. Li hemberî zimanên qels ên bi koka xwe Efrîqîne, li hemû bakurê Efrîqa û heta başurê Zagros-Torosan serdest bû. Çand û zanist jî bi Erebi tê kirin û tê jiyîn. Xwedî cihekî cihêwaz e. Yê zimanê Erebi bi kar tînin, dikarin di nava bîrokrasiyê de cih bigrin, dikarin di nava çîna zanyaran de cih bigrin û zanistê bikin. Ji lew re Erebi zimanê mezinbûn û berjewendiyan e. Girîngiya wî ya heta îro jî deyndarê van rastiyên madî ye. Piştî Erebi rola Farisî hîna bisînor e. Ew jî nexasim bi desthilatdariya Selçuqîyan li Îranê bû zimanê fermî û belav bû. Kengî Selçuqî Anatolyayê dagir dikin û dewleteke navenda wê Konya avadikin jî zimanê wê yê fermî Farisî ye. Mewlana berhema xwe ya bi navê “Mesnewî” bi Farisî nivîsandîye. Zimanê Tirkî jî weke zimanê Kurdî wê demê xelkê li derveyî bajaran weke amûrê axaftina devkî û wêjeyê bi kar tînin.

Serdestiya Erebi, li Kurdistanê bitesîr bû. Nemaze tebeqeya meleseydayan zimanê Erebi weke zimanê îbadetê dibînin û ev yek dibe sedema bandoreke dijwar. Her wiha xelkê li bajaran dilê xwe dibijînin şewaza jiyana Ereban. Em ji kinclixwekirinê şikil û şibût bigrin heta dara nîşan (secere) a xwe digihîne Ereban, dibe mode. Di çîroka her xanedaniyê de qulpeke Erebi pir normal dibe. Serdestiya di warê perwerde, hîndekarî, mode, siyaset, dîplomasi, huner û zanistê de li ser zimanekî mîna Farisî ku di warê dewletê de xwedî tecrûbe bû jî, bandor kir. Nîv bi nîv dagirkeriya Erebi diqewime, hemû Rojhilata Navîn nav û leqebên Erebi li xwe dikin. Ev serdestî heta pêşketina tégihîştina netew-dewletan û neteweyan bi awayekî dijwar didome.

Bi belavbûna sîstema kapîtalîst û şikilgirtina netew-dewlet re pêvajoya pişavtina li ser çand û zimanê Kurdî hîna diwartir dibe. Li

zordestiya Erebi û Farisî, ya Tirkî jî zêde dibe. Di serdema seretayî û navîn de çand û zimanê Kurdî yê di nava etnîsîteyê de hebûna xwe parast. Bi derfetên teknîk û zanistê yên zêdebûn sê çand û zimanên serdest weke çand û zimanên fermî bi bandora xwe zimanê Kurdî baş pelixandin û helandin. Çand û zimanê ku di serdema navîn de jî gelek berhemên wêjeyî (mîna Ehmedê Xanî, Mem û Zîn) dan, di bin zexta siyasî de her ku çû teng bû. Kurdîtî weke çand û ziman xistin rewşeke biguman. Kirin mijara guneh û gunehkariyê, her ku çû Kurdbûyîn krîmînalîze kirin. Bi pratîka herî dijwar a guneh-zindan a bûrjuvazî re rûbirû hate hiştin. Pirsgirêkên têkîliya wan bi rastiya Kurd re hebûn, di kategoriya gunehên xeter de hatin hesabandin. Her sê netewedewlet jî –Tirk, Fars û neteweya Erebi- ji çand û zimanê dewletê wêdetir li ser hemû hebûna wê helandin dûrkerin û kampanyayêke bi çand û zimanê serdest ve girêdan û bi dijwarî dan meşandin. Perwerdehiya bi zimanê zikmakî Kurdî jî tê de hemû dibistanên perwerdehiyê lê hatin qedexekirin. Lê derfet û îmkanên wî/ê hebûna dikaribûn li dibistanên neteweyên serdest modernîzm hînbibûya. Kurd û Kurdî di her warî de li derveyî modernîzmê hate hiştin. Çapkirina pirtukan rojname û mûzîkeke herî normal a Kurdî weke Kurdewarî hate hesabandin û di çarçoveya guneh de hate qebûlkerin. Lê wan bi xwe di zimanê xwe de neteweperestiyêke ku ji neteweperestiya Hîtler jî dibore dikirin. Ji teoriyên wan ên neteweyên herî mezin gav nedihatîn avêtin. “Miletê necîb” navê Ereban bû. Tirkîtî rastiyeke bexteweriyê bû. Farisî esilzadeyiya herî mezin a dîrokê bû. Hîsên neteweperestiyê yên ku kapîtalîzmê şiyar kirin, bûn xwedî bandoreke narkotîkane ku hemû rewşên paşverû binuxûmîne.

Lê sêyemîn pêngava mezin a globalbûna kapîtalîzmê mezinbûna lokaltiyê weke nirxeke pêşveçûna teknolojiyê ye. –radyo, tv- qedexeyên li ser ziman bêwate kirin. Xebatên li derveyî welat kirin ku hindekî Kurd û Kurdîtî bi ser xwe ve werin. Bêguman di bingeha vê rastiye de bandoreke diyarker a têkoşîna hemdem hebû. Berxwedana demokratîk a neteweyî bi xwe re nasnameya Kurd, ziman, çand û ji xwe bawerbûn anî. Li dijî zora şer –desthilatdariyê ya pişavtinê- bi darê zorê afirand. Ji berxwedana xweparastinê ji nû ve derketina çand û zimanên netewî re dergûşî dikir.

Hebûna Çandî Bi Ziman Pêkan e:

Hebûna çandî bi ziman gengaz e. Di vê mijarê de ziman, hêmanekî herî giring e. Ger zimanê dayîkê tê qedexekirin, ev nijadkujiya (jenosîd) çandî ye... Ji nijadkujiya fîzîkî xeternaktir e. Ma bila Kurd tune bibin? Ger ev wiha bidome, wê Kurd bihelin û biçin. Ma emê nikaribin zimanê dayîka xwe bixwazin? Ger ez dê nikaribim bi zimanê xwe yê zikmakî biaxivim, ger dê zarokên min nikaribin hînî zimanê xwe yê dayîkê bibin, ma wê demê çi wateya jiyana min dimîne?

Yê ku qeyd û kelepçe li zimanê wî hatibe xistin, li mejiyê wî, dilê wî nerîna wî jî qeyîd û kelepçe hatiye xistin

Perwerdeya bi zimanê dayîkê, mafê herî girîng û bingeşîn e; di nava mafên sê nîşan de cih digire. Di hevpeymanên Ewrûpa de heye. Di hevpeymanî mafên kesî û şaristanî û hevpeymanî mafên aborî, civakî, çandî ya Netewên Yekbûyî de jî ev maf heye.

Tu neteweyeke bêziman nikare were hizirandin, lewma divê xebatên di barbarê zimanê Kurdî de çalaktir bin. Ma çima heta niha Saziyeke Zimanê Kurdî nîn e. Ataturkî jî dema nû komar damezirand, destpêkê Saziya Zimanê Tirkî saz kir. Divê em jî bi lez bigihên saziyeke bi vî awayî. Ger heta niha saziyeke bi vî awayî nehatiye avakirin, ev yek kêmasiyek e û divê di demek berî demekê ev kêmasî ji holê were rakirin.

Her wiha ev yek weke Akademiya Ziman jî dibe. Ya girîng ew e ku di demeke zûtirîn de, di warê zimanê Kurdî de saziyeke wiha pêk bê. Divê ev xal werin nîqaşkirin û bigihîjin biryara sazîbûna Zimanê Kurdî.

Ji bo zimanê bijartî jî divê hêdî hêdî komîteyek li ser kar bike û bixebite. Niha dema vê ya rast e û derfetên vê yekê jî hatine afirandin. Divê ji bo Kurdiya bilind komîteyek were damezrandin. Kî ji ziman fêm dike, dikare dîroka ziman a heta roja îro lêkolîn bike, wan zanînan berhev bike û bi rêya xebateke demdirêj a vê komîteyê ve dikare zimanekî resen û hevpar ê kurdî saz bike. Yanî mirov dikare Soranî, Dimilkî, Kurmancî û Goranî jî pêş bixe. Piştî jî gel dikare vê yekê weke zimanê xwe bi kar bîne. Divê sîstema ziman wisa were meşandin. Heta ev yek pêk were jî divê her zarava di qada xwe de xebatê bimeşîne, bi wî zimanî klaman biste, biaxuve û çawa dixwaze dikare wisa bi kar bîne. Azadiyeke bêşînor... Em li vê derê nikarin zagonên vê yekê ava bikin. Ev tiştêkî xwezayî ye. Ji bo tiştên xwezayî hem dem û hem jî cih hewce ye.

Ya ez dixwazim bikim hem ji bo zimanê Kurdî, hem jî ji bo zaravayên din afrandina qadên azad e. Ger ez niha zimanê Kurdî weke zimanê fermî îlan bikim, dê ziman bi xwe zerarê bibîne. Sedema yekem pir kes jê fêm nakin. Ya duyem ziman hîna xwe ava nekiriye. Gelek zarava têkilhev bûne. Ev yek dê bibe sedema parçebûn û cahiliyê. Ger mirov a rast bibêje, her kes dikare bi zemîna ku me afirandiye biaxive, heta dikare bi zimanê eşîreta xwe jî biaxive. Divê mirov ne li dijî vê yekê be.

Mînak berê jî digotin ku “ger tu dixwazî ji bo Kurdîtiyê hinek tiştan bikî, divê tu destpêkê rê bidî zimanê Kurdî”. Min tu caran li pêşiya xwe nekir asteng. Hinek ev sed salin dixwazin ji bo ziman hinek tiştan bikin, lê nikarin ji bo Kurdîtiyê hinek tiştan bikin. Min bi Kurdiyeye bihêz dest bi şoreşê nekir. Min bi zimanê Tirkî dest bi şoreşê kir, niha jî xizmeta herî mezin ez didim. Kurdîtiyê wisa ez bi kûrahî û dirêjahiyê ve dimeşînim. Ji gelek zaravayên cuda pir pirtûk jî çap dibin. Min bi xwe ev nekirin, lê min rê li ber van vekir. Min derfetên siyasal û îdeolojîk afirandin. Tuyê çend salên din bi şûn ve jî bibînî ku dê Kurdîti jî cihê xwe yê herî mezin bigre. Ya tê meşandin û ya rast jî ev e. Yên din pir baş nakin, pirsgerêkê gelekî teng digrin dest, ger wisa bidomînin dê bidin windakirin.

Di nava me de tu caran pirsgerêka zimanan dê dernekeve. Dibe ku di demên pêş de li dibistanên me zimanê tirkî û yê erebî jî werin bi karanîn, divê mirov misoger ji vê yekê netirse. Lê divê mirov hêdî hêdî dibistanên Kurdî bide avakirin. Ev heta demekê jî dê bi hev re werin bi rêvebirin. Ger Kurdî qels be, dê zimanên gelên cîran heta demekê serdest bin, piştî dê hêdî hêdî bigihên heman astê û di nava hevsengiyekê de werin meşandin. Bi demekê şûn ve jî êdî dê zimanê Kurdî yê bilind serdest be. Ji beriya her tiştî ger em bikaribin di siyaseta xwe de serxwebûnê bi dest bixin, dê çand jî bi vê yekê re bi pêş bikeve û serdest be. Divê mirov ji bo vê yekê dijminahiya zimanan neke. Ger mirov dijminahiya zimanan bike, nikare tu tiştî jî bi dest bixe.

Lê divê mirov bi hêz û kûr jî li ser zimanê xwe rawest e. Bi qandî ku mirov ne xwedî nêzîkatiyeke weke “min bi zimanê dijmin dest pê kir heta dawiyê jî ezê wisa bidomînim” be, her wiha divê mirov di vê mijarê de nêzîkatiyeke pir teng jî raber neke. Nêzîkatiyeke weke “ez ji zimanê xwe pê ve hînî tu zimanan nabim” jî nêzîkatiyeke pir di cihê

xwe de nîn e. Di bingeha xwe de her du nêzîkatî jî yek in. Her du jî zirarê didin. Divê mirov di vê derê de hevsengiyekê bi dest bixe. Ez dibêjim ku zarava jî pê re, her kê çi dixwaze bila wisa bike, lê zimanekî xwedî hêz jî hewce ye. Divê mirov çend zarokan ji dibistana seretayî heta bi zanîngehê rêxistin bike. Heke ku bi vê şêwazê bi rê ve biçe ez bawer nakim ku tu pîrsgirêk derbikevin holê. Derfet tên afirandin, her ku diçe qadên xebatê jî zêde dibin. Mirov dikare mamosteyan li hev bicivîne û li ser hinek binaşe (plan) û bernameyan bixebite. Mirov dikare xebatên ziman bi şêweyê wergirî bi vê azîneyê bi rê ve bibe.

Di cîhanê de hatiye peyitandin ku nêzîkatiya nîjadî nêzîkatiyê herî paşverû ye. Nîjadperestî nûnertiya paşverûtiyê dike. Tu nirxeke çand û zimanê nîjadeke paşverû nabe, tune ye, ev yek şaş e û dê hêdî hêdî ji holê rabe. Ev nêzîkatî li dij mirovahiyê ye. Rast e; dijmin, te ji zimanê te qut dike, jiyana xwe û zimanê xwe li ser te serdest dike, wê bi te dide hezkirin û dihêle ku tu ji zimanê xwe nefret bikî. Di vê derê de wêrankariyê mezin heye. Lê tiştêkî dîtirê jî heye. Ez bêhtir hînî tirkîyê dibim, heta ji Serokomarê dewletê zêdetir ez hez ji taybetmendiyên tirkîyê dikim. Lê ev li pêşîya hezkirina min a kurdîyê ne asteng e. Berevajiyê vê Kurdîtiya herî mezin jî min kir û dikim. Vaye ev meseleya enternasyonalîzm, humanîzm û biratiyê ye. Ger van bi hev re nemeşînî tuyê bikevî nava xeletiyê pir mezin. Nîjadperestiyeke teng sedema mirina gelên weke Ermenî û Sûryaniyan e.

Ji aliyê din xwe nedana helandin jî xaleke gelekî girîng e. Min xwe neda helandin. Ma hun dizanin şertê min ê yekem çi bû? Min ji zaroktiya xwe û vir ve helandin da rawestandin. Ez bûm karmendekî mezin jî, min zanîngeh jî qedand, lê ji bo ku ez xwe nedim helandinê min tenezila jiyana serdest jî nekir. Ez naxwazim we rexne bikim, hînbûna ziman jî gelekî girîng e. Lê niha hun serê min jî jêbikin, ez nikarim hînî zimanê kesekî bibim. Gelek ziman hene; hun tevahiya Ewrûpa jî bidin min, ez hînî zimanê wan û jiyana wan nabim. Ez nîjadperestekî teng nînim, gelekî mirovhez im, lê bi zimanên din nikarim biaxivim, hez nakim. Çi xizmetî biratiyê û yekitiyê bike ez ji wê hez dikim. Di vê mijarê de min xwe terbiye kiriye.

Bingehê biratiyê mezinkirina Kurdîyê ye. Ev yek ji bo gelê Kurd a herî baş e. Mînak hinek rêberên Kurdan cilên Kurdî li ber xwe dikin, lê koleyên herî mezin ên dijmin in. Her dem bi Kurdî diaxivin, lê xizmeta ku ew ji nîjada Tirkan û faşîzma Tirk re dikin, Tirk bi xwe jî ji

xwe re nakin. Vaye di vê derê de mesele tenê liberxwekirina cilên Kurdî û axaftina peyvên Kurdî nîn e. Pirsgirêk rêzdariya ji biratîyê û mezinahîyê re ye. Rêzdariya ku me heta niha ji biratîyê re raber kiriye heta niha tu rêberan raber nekiriye û em dixwazin vê yekê bi vî awayî jî bidomînin. Li hember Tirkan misoger ez xwe biçûk nabînim. Li hember paşa û serokên wan xwedî rêzdarîyeke mezin im. Ez şivanek im, gundiyeke ji rêzê me. Lê zanîna neteweyî ya ku min bi dirustî wergirtiye nîşanî min dide ku Kurd jî miletek in, Kurd jî mileteke xwedî şeref in û misoger divê werin pejirandin.

Hinek serokeşîran şewazek afirandin. Cil û bergên Kurdî li ber xwe kirin, bi zimanê Kurdî axivîn, lê mala Kurdan wêran kirin. Ev derseke mezin e. Divê rewşenbîrên me bi giranî li ser van mijaran rawestin. Bila tişteke xelet nekin. Dibistanên Kurdî çêdibin, mirov dikare heta bi zanîngehan jî ava bike, lê ji bo vê yekê hewceyê bi demê heye, bi amadekariyan heye. Ev meseleyeke zanistî ye, lêkolîneke zanistî hewce ye, derfet hewce ne. Bi qedexeyan jî, bi cilan jî nabe, tenê bi çend peyvên sivik ên Kurdî jî nabe. Ev yek hatiye peyitandin. Hinek ji bo min dibêjin “çima bi Kurdî naxive?” Nexêr! Ez dikarim xebatên bi Kurdî bidim meşandin. Min di serî de jî anî ziman, min ji bo klameke Kurdî dest bi şoreşê nekir. Ev nêzîkatîyên xelet in. Bila tu kes xwe nexapîne, bila tu kes li ser me bi erzanî neaxive. Nirxa xebatên ku min li ser çand û zimanê Kurdî kirine gelekî mezin in. Ez van ji hev cuda dikim. Mirov çawa dikare bi çanda gel û dilê gel re be, dîsa mirov çawa dikare bi dijminên gel re be? Van her du xalan ez baş ji hev derdixim û pêk tînim.

- 1) Dive vekî her zimanekî di zimanê kurdî de jî têgînên zimanzanî û rêzmanê kurdî bibin yek. Heke di vê mijarê de yekîtiyeke birêkûpêk di navbera hemû zaravayen de ji bo a niha ne gengaz be jî, divê di vê mijarê de têgînên her zaravayekî bibin yek. Wekî mînak di zaravayê kurmancî de her kesê ku rabûye li gorî xwe navek li têgînên wekî kirde, pêveber, hevalnav, cînavk, lêker û hwd. Kiriye. Divê şura di vê mijarê de bigihêje biryarekê û dawiyê li van nakokiyê ku dibine sedema alozî û telihevîyan bîne

- 2) Dşvê Şura diderbarê alfabeyek neteweyî de jî bigihê je biryarekê. Di vê mijarê de em alfabeya latînî pêşniyar dikin. Di heman demê de divê aloziyên di tîpên alfabeyê de yên mîna rengedeng û tîpên dubare jî bêne sererastkirin. Di vê mijarê de jî, em rêbaza Celadet Bedirxan pêşniyar dikîn.
- 3) “Ji bo zimanê bijartî jî divê hêdî hêdî komîteyek li ser kar bike û bixebite. Niha dema vê ya rast e û derfetên vê yekê jî hatine afirandin. Divê ji bo Kurdiya bilind komîteyek were damezrandin. Kî ji ziman fêm dike, dikare dîroka ziman a heta roja îro lêkolîn bike, wan zanînan berhev bike û bi rêya xebateke demdirêj a vê komîteyê ve dikare zimanekî resen û hevpar ê kurdî saz bike. Yanî mirov dikare Soranî, Dimilkî, Kurmancî û Goranî jî pêş bixe. Piştî jî gel dikare vê yekê weke zimanê xwe bi kar bîne. Divê sîstema ziman wisa were meşandin. Heta ev yek pêk were jî divê her zarava di qada xwe de xebatê bimeşîne, bi wî zimanî klaman bistre, biaxuve û çawa dixwaze dikare wisa bi kar bîne. Azadiyeke bêşînor... Em li vê derê nikarin zagonên vê yekê ava bikin. Ev tiştêkî xwezayî ye. Ji bo tiştên xwezayî hem dem û hem jî cih hewce ye.” “Tu neteweyeke bêziman nikare were hizirandin, lewma divê xebatên di barbarê zimanê Kurdî de çalaktir bin. Ma çima heta niha Saziyeke Zimanê Kurdî nîn e. Atatürkî jî dema nû komar damezirand, destpêkê Saziya Zimanê Tirkî saz kir. Divê em jî bi lez û bez zimanê xwe bigihên saziyeke bi vî awayî. Ger heta niha saziyeke bi vî awayî nehatiye avakirin, ev yek kêmasiyek e û divê ev kêmasî demek berî demekê ji holê were rakirin. Her wiha ev yek weke Akademiya Ziman jî dibe. Ya girîng ew e ku di demeke zûtirîn de, di warê zimanê Kurdî de saziyeke wiha pêk bê. Divê ev xal werin nîqaşkirin û bigihîjin biryara sazîbûna Zimanê Kurdî.”
- Di vê mijarê de, ji bo ku Akademiya Zimanê Kurdî li Amedê bê vekirin, hem biryara Komîteya Ziman a KNK'ê, hem a Komîteya Ziman û Perwerdehiyê ya KCK'ê û hem jî ya TZPKurdî heye. Lê mixabin ji ber pirsgirêkên aborî ev yek heta niha pêk nehatiye. Divê di vê mijarê de jî, anku di derbarî pêwîstiyên madî û giyanewî yên Akademiya Ziman a ku wê li Amedê bê avakirin Şura bigihêje biryarekê û di her hêlê de bibe alîkar.

- 4) Divê di derbarê ferhengeke hevpar a zimanê kurdî Şura bigihêje biryarekê û ji bo vê yekê li her çar parçeyên kurdistanê komîsyonên xurt bîn avakirin, ev komîsyon jî di bin banê akademyê de bigihêjin hev.
- 5) Dive ji bo peydakirin, dahûrandin û derxistina roniyê ya dîrok , çand û zimanê bavkalkên kurdan Hûrî, Kasît, Gotî, Mîtanî, Naîrî, Urartû, Med û hwd. Komîsyonek lêkolîner û zimanzanên xurt û pêçêbûyî bê avakirin. Ew komîsyon jî divê demek berî demekê zend û bendên xwe hilde û bikeve nava kar û xebatan. Em vê belgeyê jî wekî pêşnûmayekê pêşniyarî wê komîsyonê dikîn.